

Sal:2 Hejmar 74 18-24 Tîrmeh 1993 5000TL (KDVD)

Rojnameya Hefteyî

Navê
mirinê
Gîhadîn e!

Zahîr Kayan



Rûpel 9

Hikûmeta nû çareserkirina pirsgirêka Kurd teslîmî artêşê kir

Hêviya aştiyê vedimire

Rûpel 8




Li Kudistanê bi navê "operasyonan" her roj gund têne xera kîrin Gundiyên Kurd têne girtin.

Hozan Seyîdxan:
**'EM BI ÇANDA
XWE BI QEDR Û
QÎMET IN'**

Hevpeyvîn:
Bêrîvana Dêrsimî

Rûpel 11



DI DÎROKA
KURDISTANE DE
EBÛ MUSLIMÊ
XORESANÎ

Selim Bigruk

Rûpel 12

Me sond xwariye

Berf dibare
Ziravok ziravok
Li çiyayên welatê me:
Li Çiyagewrkê,
Li Çiyayê Èlem, li Paltokan
Ji nediyiva
Bi metroyan lopî serhev

dibe

Gund wînda dibin

Li bin berfê
Lê ax germok e
Avis dimîne
Ji gul û sosinê
Kesk û sor û zer
Bayê çiyan tê
Bi hêrs û gira xwe
Rikevî ser mirovan dike
Mizgîna azadî û

serxwebûnê tîne

Guhê mirovan dibe

Sar e

Serma ye

Mirovan bi welat ve

digerisine

Li ber xwe didin partizanê

me

Ser dikan

Bi baweriye

Rêçika dice azadiyê

Qeteh dikan

Bi roj û şev

Wa ye gerilayen me

Ala serxwebûnê

Ala kesk û sor û zer

Li ser çiyayê me

Heval Welat li Çiyagewrkê

Heval İsmâîl li Çiyayê Èlem

Heval Memo, Sevkan û

Hêviyê

Li Çiyayê Paltok û Tatos e

Bi xwîna xwe çikilandine

Ala me li ba dibe

Lê belê em li ku ne?

Newroz vêca nehatiye

Li serê çiyayê me

Agirê azadiyê vêdikeve

Çiyayê me û mirov

Xwe ji Newrozê re amade

dikan

Rê dû re

Rê bi aşit e

Bi berf e.

Bi qesem e.

Lê belê!

Lingê qerisi ber xwe didin

Keçen me û xorêtê me

Sond xwarin bi hev re

Tak û tola rêhevalan

Memo, Sevkan û Hêviyê

Hilnedin

Ji sonda xwe ya

An welat an mirin

Em venagerin

Biji Têkosîna

Rizgarî û serxwebûna

Gelê Kurdistan

**Keçikên Tatostî:
Hewşen û Rindê**

Rastî bi berfê nayê ni xumandin

Di vê domanê de gelek xwîn hat rijandin, bombekirin û xerakirina gundan tev ci ne? Kesêñ hez ji welatê xwe dikin, têne kuştin, têne işkencekirin. Mirovên xiyanetê dikin û tiştên gemar dikin têne parastin.

Ketina merheleyeke nû tê dîtin. Hikûmeta di bin rîveberiya Tansû Çiller de, xwe ji nû ve teverand. Èrisen gerîla êdi nayên hejmartin. Kesêñ li hemberî şer in, dengê xwe di parlamentoye û raya giştî de hilnadın. Pirranya van kesan newérin dengê xwe bilind bikin. Hinek ji wan jî. li hêviya şersekînandinê ne. "Eceb kengî şer careke din dê bê sekînandin, da ku em ji bibêjin em ji aştiyê dixwazin, em şer naxwazin." Di dewletê de ji van bêhtir kesêñ dibêjin "em şer dixwazin" hene. Daxwaziya van kesan ji beli ye.

Helkirina meseleya Kurdi zore!

Dewlet kemasîyên xwe bimire ji qebûl nake. PKK du meha a-girbest (şerrawestin) ragehad, belê dewletê ev yek red kir. Pirrani bi hilan û virran dixwest xwe jê xelas bike. Serokê PKK'ê A. Öcalan got, "Em dixwazin bi aşti, bi biratî bi gelê Tirk re bijin" û ku ji bo veristandina siyasiyê amade ne. Ji vê pê de, "dewlet vê başuya me nebîne, şerê ku derdi keve wê bi rastî bibe sebebê mîrina gelek mirovan." İro ev rastî tê cih. Tengasiya dewletê çiqas

mezîn e. Politika hikûmeta nû ya di bin serokatiya Tansû Çiller de avabû, wê çiqas bikaribe li ser lingan bisekine? Vê carê wê ji bo pirsgirêka Kurdan ci bibêjin û çibikin? An wê weke hikûmeta Demîrel, "Em rastiya Kurdan nas dikan, heqê demokrasiyê

emê bidine we" bibêjin û dû re tu gavekî ji navêjin. Em dizanîku politikaya Demîrel û Înönü iflas kiriye. Tu heq nedan Kurdan piçek demokrasî ji nedan. Ji vê tê xuyakirin ku dewlet ne samîmî ye. Heya niha ci gotibû d

avê de çûye. Ji her alî ve wis

ye. Ji aliye şer ve, ji aliye şer berdanê ve, ji aliye diyalogê ve binketiye. Politikaya wî bi giranî niha şerê psikolojîk e. Mesela hercar dibêje, "Em vê carê PKK'ê ji holê radikin", "Me qerergeha PKK'ê hilwesand" û tiştên wek vî dibêjin. Gelek kes dibêjin ku siyasetek nû çenebe dewletê wê xedarî bikeve. Elemanyekî... yê Amerîke ku karî wi lêkolîna li ser dewletan e vê yekê dibêje: "PKK ji tevgeren Kurdish tevan pêşketitir e û bi giranî cihê xwe di nav wan de digire." Bi vê yekê dibêje ku dewlet siyaseta xwe neguhêre, dibe ku di sala 2000'an de ji holê rabe. Dîsa Mahîr Kaynak berpirsiyare MîT'ê yê kevin, "Bi bombebarandin, bi zora leşkerî meseleya Kurdish hal nabe. Ev mesele ne tenê meseleya PKK'ê ye" dibêje. Hinek rojnamevanê Tirkan ji di vê baweriye de ne. Ser-nîşkarê rojnameya "Sabah" e Hasan Cemal dibêje. "EZ gelekaran çûme başûrê rojhilatê bi rastî ji tiştên min dîtin ne hindîn. Zarokên di nav dibistanê de ji dilê xwe ve bi xweşî qala Apo dîkin.

PKK qurmên xwe yê dirêj di nav gel de çikandine. Carinan derbeyan bixwe ji, tesîr pîr nadî. Yek din ji rojnameyeke Tirk dibêje "Dewlet bi vî halê xwe winda kiriye. 'Terorist' diavêjin ser qereqolê, pişî terorist ji wir winda bibin êdi dewlet bi

hewarê ve tê." Gelek mirovên din ji dijêjin, "PKK'ê sa xurt di be, disa dixwaze û şerifîfe bixe destê xwe."

Kesêñ ser hikmê ne di vê

bir û baweriye de n

Hikûmeta

Tekiliyê

hikûmetî û artêşê v

cawa bin?

Tansû Çiller hat ne hat, "Emê

meseleyê êdi ji kok e hal bikin,

ez bang li hemû ke

n dikim em

bibin yek û terorî

vê carê

binketi bikin." Ji aliye şer ve ev

gotinê wan komik

ji aliye

din ve kifş e ku wê

Tirk qetli-

amên nû.

çend provâsyanen

nû çibikin. Nimûneyel Serokê

Artêsa Tirk Doğan Güç

dibêje

ku em PKK'ê heyâ zivatânê ra-

nekin, bi rastî ji emê Cerîna A-

warte ilan bikin. Yani wê qetli-

amên hîn bêhtir fireh bînîn.

Di civîna Heyeta Ewle

Neteveyî de bang li rojnevanan

dikan û dibêjin ku li teşâsına li

hemberî "terorizmê" al-

an bikin. Niha planê wan ev

1. Millî Mutabakat

îmî partî,

rojnamevan, profosor,

rewşenbir û hwd, wê yekîti cibî-

kin û bi devekê bipeyivin.

2. Her kes ji van divê bi karê

ku dimeşîne, li hember teşâsına

Kurdistanê şer bike. (Nîşanîne:

Rojnamevan divê der heqê dew-

letê de baş bipeyin.)

3. Waliyên li Kurdistanê

divê bi serê xwe tu daxuyanî

nekin.

Daxuyanî êdî tenê ji aliye

Rêveberiya Taybetî ve wîlin ki-

rin.

4. Serê psikolojîyê divê hîn

bêhtir bê meşandin.

Niha wisa tê dîtin ku wê

giranî bidin ber van maddeyan.

Qasim

Lehengên 14'ê Tîrmehê sembolên mirovahiyê ne

Di dîroka Kurdistanê de û bi taybeti di ya partiyê de gelek lehengiyê mezîn çebûne. Hin lehengî hene ku dîrokê werdigerînin, qedera gelekî diguherînin. Di nav rûpelên dîrokê de cihê xwe distînin. Lê ev her demî û gelek carî çerabin. Bi taybeti di demîn man û nemanê de dibin. Di demîn wiha de hin rol dikevin ser milîn hin kesan. Demâ ev kes rolên xwe leyîstîn û baş pêk anîn, karin ji tunebûnekî hebûneke mezîn biafirînin û ew bi xwe bibine dîrok.

Pişî 12'ê İlonê dijîn di ke-sayetiya dîl (êsrîn) Zindana Amîde de, bi her awayî nemana gelê Kurd dabû pêsiya xwe. Gelê Kurd ketibû tariya mirinê.

14'ê Tîrmehê ji di demek wiha de bi lehengî û berxwedaneke mezîn rola xwe leyîst. Di têkosîna rizgariya Kurdistanê de bû dîrok û bû agirê têkosîna serxwebûn û azadiyê. Hin tist hene ku, gotin têri qalkirina wan nake. Bi rastî ji tu gotin têri qalkirina lehengî û bi-

wan dan û dengê mirovahiyê

bilind kîrin. Lî dijîn her wekî

mejîyê wî çavên wî ji kor bû.

Rûyê xwe nedît. Li hember wê

mîrxaşî û berxwedana wan dijîn

ewçend biçûk bû ku, nedî-

hate dîtin. Di rojîya mirinê de

pişî 57, 59, 62 û 65 rojan çar

can bûne çar ronâhî, ber bi ez-

man ve bilind bûn û tevî serkar-

wanî ya şehîdîn ne mir bûn.

Mirov deh salî ji bijî û sed salî

ji bijî, dawî bi ci awayî dibe

bîbî mirin e. Tu garantî ji mi-

rinê re tune ye. Kengî bi ci

awayî mirov dimire ne xuya ye.

Pişî ku wîsa ye, divê mirina

mirîjî rûmetek jê re hebe. Mirov

ji mirovahiyê re, ji welatê xwe

re tîstek li dû xwe bihele, bi zor

wê demî maneyek ji jiyana

mirîjî re çedîbe. Ev lehengî bi

jiyanâ xwe, bi berxwedana xwe û

bi şehîdîn xwe, bûne sem-

bolên mirovahiyê. Ci serbilinda-

hiyeke mezîn e ku, mirov di

rêça van sembolên mirovahiyê

de here.

Salar Amedi

FERH

Nûçeyên cengê

Dewlet li hember êrîşen gerîlayen ARGK'ê zora xwe ya li ser şewitandin û valakirina gundan bêhtir kir. Roj nîn e ku gundek an devereke li Kurdistanê nêyê bombekirin û şewitandin; bi mebesta ku ji PKK'ê re piştgiriya lojistikê dikan. Di raporê Komeleyên Mafêni Mirovan de jî diyar bû ku vê salê ji 500'i zêdetir gund bi vî a wayî hatin valakirin. Li hember van hemû kiran, êrîşen gerîlayen ARGK'ê tenê li hember avahî û hêzên leşkerî çedibin, wekî din iştîfayê cerdevanan didomin. Cerdevan pirri caran ji ber ku dewlet iştîfayê wan qebûl nake, çekên xwe diavêjin baxçeyen qereqolan û diciñ.

Navenda Nûçeyan- 9 Tîrmeh 1993: Dewlet şewitan-dinê gundan didomîne. Piştî gundê navçeyen Lîcê, Pasûr (Kulp) û Çepekkûrê (Bingolê) vêca çar gundan bi navê Serdê, Koçeran, Bateyt û Hurî ku li ser navçeya Hêne (Hanî) ne li hember van hemû zordestiyan nişte-cihêndan ji gundan xwe koç nekirin.

Piştî şerê di navbera gerila û hêzên dewletê ku di 7'ê Tîrmehê de li gundê Görondoruk ku li ser navçeya Dihê (Eruh) ya Sîrtê ye pêk hat; dewletê avêt ser vî gundi, bi topan malan xera kir. Gundiye bi navê Huriye Kiliç mir. Gundi ji gund koç kîrin. Li hêla din navbera gundan Zender, Çeman, Kenxdar û Zi-yaret gerila û hêzên dewletê li hev xistin, serbezak û 2 leşker mirin, 3 leşker birîndar bûn. Di şerê gerila û dewletê de, li gundê Yestê ku li ser navçeya Mahsîert (Omerli) ya Mêrdinê ye. 8 gerila hatin kûstîn. Gerila riya di navbera Erzingan û Dêrsimê birî, 2 tankêr şewitan-din.

10 Tîrmeh 1993: Hêzên dewletê gundê Timoq şewitan-din. Berî demekê niştecihêndan ji ber zordestiya dewletê dev ji gundê xwe berdabûn û çû-bûn, lê eşyayê xwe nebiribûn.

Li ser vî awayî hêzên leşkerî malen gund tevî eşyayê wê şewitandin. Tumoq li ser navçeya Hezo (Kozluk) Batmanê ye. Gerila li hêla Pira Malabadê du navgînêñ şixul ên belediyê şewitan-din. Gerîlayen ARGK'ê li ser riya Agîrî kemîn danîn. 7 leşker mirin.

Li Amedê û li Bismilê ji bo bî-ranîna Wedat Aydin û şehidê ku di cenazeyê wî de hatibûn kuştin. Esnaf kepengen xwe dadan.

11 Tîrmeh 1993: Gerila 4 cahş kuşt. Li gundê Keçela (Beklemez) ku li ser navçeya Hamur ya Agîrî ye. Turhan Oğuz, İsmet Peligan. Dînçer Levent û Ferîde Levent ji ber ce-hîştiyê ji alî gerila ve hatina kuştin. Di şerê gerila û dewletê de, li hêla Kocakoç ku li ser Dêrsimê ye. 2 leşker mirin.

3000 leşker li Hezo navçeya Batmanê hatin bi cihwarkirin.

ke. Bi vî awayî esnafê navçeyen Şîrnex, Hezex (İdil), Hezo (Kozluk) Bişeri, Misirc (Kuratalan) û Bazîd kepengen xwe gitin, şofêran ji qontox qefaltin.

Ji sedî sed esnaf beşdarî vê protestoyê bûn. Li Cizîrê li serîya 150 kesen esnaf tevî hev dicin ber qereqolê û bi dengekî di-pirsin ka gel çikirîji ji dewletê ku evqas zilm li wan tê kîrin. Rêvebirê qereqolê wiha axivîn: "Li ser eniya we nanivisine hûn esnaf in an na? Hûn hemû ji PKK'ê ne. Ji iro pê ve yek ji me bê kuştin emê we teva bikujin. Ji we kîri ev hê tiştek e, di destê me de çekên ku gîrsê gel bi carêkî dikujin hene. Gava em wan bi kar binin hûn wê gavê binîn bê Cizîr çawa ji binî ve xera dibê."

Dewlet li Mêrdinê ji gundekî şewitand. Gelê gundê Sebê Mahsîert (Omerli) ku navçeya Mêrdinê ye ji ber ku cerdevaniyê nepejirandine gundê wan hate şewitandin.

Gerila avêt ser qereqola Yenidogân ku li ser navçeya Aralik ya İdirê ye, 9 leşker, serbazek û cerdevane mirin. 5 leşker birîndar bûn. Gerila ji Culemîrgê (Hekarê) Xawutê û gundê Wanê Gelizek, 15 cerdevan revandin.

Di cerda gerila ya ser Qereqola Xizan a Bilîsî de, qereqol îmha bû û weke ku ji nûçeyen herêmê tê fémkirin bi firokeyan misêwa birîndar radibin Nêx-wêşxaneya Tetwanê.

Li gundê Nergîlê ku di navçeyen Elbistan û Ekînözü de ye gerila û hêzên dewletê li hev xistin. 7 leşker û cerdevane mirin. Piştî vê bûyerê hêzên dewletê gundan derdor tehdit kîrin û xwestin ku gundan vala bikin.

Ji gundê Bidrê ku li ser navçeya Sasonê ya Batmanê ye 12 cerdevan istifa kîrin. Gerila Endamê Meclîsa Belediyê ya Sasonê Süleyman Çiftçi revandin bi vî awayî ji gundê Bidrê ev cerdevan istifa kîrin.

14 cerdevanen gundê Derincê ku li ser Sasonê ye çekên xwe dariñ bexçeyê qereqolê û istifa kîrin.

15 Tîrmeh 1993: Ev du sê roj e qûntara çiyayê Cûdi tê bombekirin û bi hêzên bejê hat destekirin. Bi vî awayî daristan û zeviyen dorhêlén Dûgûhga û Di-vînê bi tevahî şewitîn. Li hêla Bilîsî ji derdorê navçeya Narlidere hate şewitandin.

Di 8' Tîrmehê de gerîlayen ARGK'ê avêtibûn ser qereqola Ridek (Tanyar), piştî vê, hêzên dewletê êrîşkê pêk anîn, gund û zeviyen dorhêlê bi bombeyan şewitandin. Li Kerboranê (Dargeçit) navçeya Mêrdinê şofêran ji ber zordestiya cerdevanen Midyadê ku li wan tê kîrin. protesto bikin qontaxen erebeyen xwe qefaltin.

HAWAR

Dilbixwîn

Piştî pênc salan

B erî vê bi hefteyekê nameyek ji min re şandibû. Ji gundê me hinartibû. Di nameya xwe de qala rewşa gel û pêşveçûnê siyâsî, civakî kiribû. Bi rastî min bawer nedikir ku pêşveçûn çêbibe.

Li ser daxwaza xwediyê nameyê, ji bo weşandinê ji xwendevanê Welat re pêşkêş dikim:

"Hevalê hêja... Di serî de ez silavê xwe û hemû hevalan ji we re dişînim. Serketina xebata we cihê serbilindî û şahnaziyê ye. Ger derfet hebin ji kerema xwe re vê nivîsê sere rast bike û ji rojnameya Welat re bişîne.

Heval û hogirê hêja. Gund ne gundê berê ye. Di ser cudabûna me de pênc sal derbas bûne. Di van pênc salan de bi dehan şehîd û bi sedan şoreşger ji van gund û herêmên dor derkotine. Bawer bike civîn û semîneren ku li van gundan çedibin, li komeleyen we çenabin..

Dema ku heval têne gund, gundî bi zarok, pîr û kalêñ xwe bi kîlometran diçine pêşîya hevalan. Gelo, li cem we jî gel evqasî diçê pêşîya hevalan? Ez ne li wir im, lê li gorî ku dibîhîsim hestêne welatparêziye di nava Kurdê Ewrû-

payê de geleki qels û zaif in.

Di vê mehê de hevalan qaseteke vîdiyoyê anîne gundê me, 5-6 gund li hev civan-din. Bû qiyamet. Dapîra min jî 100 salî ye, hatibû li qasetê temaşe bîke. Qasetâ ku he-valan anîbûn, Newroza 93'yan bû. Ez navê wan

bajaran nizanim, lê li gorî axaftina ku bi Almanî hatibû kîrin, ew cih bajareki Almanyayê bû.

Şevêne we sar in. Hûn weke nexweşan sloganan di-avêjin. Dapîra min Eşyê jî, ji wê sarbûna we ne razî ye. Tişte bêhtir bala min kişandibû ser xwe ev bû: Dema me-saja Serok hate xwendin hûn geleki ne hisyar bûn. Wê demê dapîra min devê xwe anî ber guhê min û got: "ma ev kesen li vê şevê ne Kurd in?" Min bersiv da: "Kurd in." Hêrs bû û got: "Madem Kurd in, çîma slogana "Bijî Serok Apo!" navêjin?"

Li gorî ez dibîhîsim, li wir ciwanen Kurd guliyen (ke-ziyen) wan hene, gulîyan dihonin. Guhar di guhê wan de ne, kesbûn û taybetiyen neteweyî li ser wan nemaye. Nayîn civînan, li nûçeyen welêt guhdarî nakin. Mixabin ku ciwanen Kurdan têkevin vê rewşê.

Li vir ciwanen me bi awayekî din in. Yek xwe diavêje pêşîya yê din û dibêje: "Ezê tola (heyfa) hevalê şehîd hilî-nim, ezê tifinga filan hevalî hilgirim..." Dema ku hevalan dibînîn dibêjin: "Wê ci rojê dora me were?" Heval dipirsin: "Hûn amade ne?" Belê, ciwanen me yêne bavegid weki millîtan radiwestin û wiha bersivê didin: "Em amade ne"

Gund ne gundê berê ye. Jin ne jinê berê ne, mîr jî ne mîrên berê ne. Dema tu li zarokên gund dimêzinî, tu matmayî dimînî. Gava ku "Bijî Serok Apo!" dibangînin, a-gir ji çavêwan difirre, weke pizotan in.

Edî zarokên me navêne weki Beko, Heso, Remo, Xecê, Fatê û hwd.napejîrinin (qebûl nakin). Navêne şehîdan ên weki Bêrîvan, Egîd, Ferhad, Rûken.... Li xwe dikan. Mirov dikare ci navî li vê guherîne bike?

Eger hûn vê nameya min di Welat de biweşinîn, ezê gelekî këfxweş bibim. Heke hejmara ku ev name tê de were weşandin têkeve destê min, ezê gundiyan li hev bi-civînim û ji wan re bixwînin.

Béguman kîmasiyen nameyê yêne rîzimanî û rînivîsî hene, ji kerema xwe re sere rast bike. Ez naxwazim na-meya xwe biqedînim, lê neçar im li vir xatirê xwe ji we bixwazim. Câreke din silava xwe dubare dikim û bi hêviya hevdîtinê dibêjim: Di riya serxwebûn û azadiyê de her dem bi pêş ve. Tevî silavê şoreşgeri

Bexda le lêdanêkiy tiri Amerîka detirsê

(SORANI)

Nûçeyen Derve Diway ewey Êraq ney hêst grûpiy pişkinîniy ser be UN karekanî xoy be cakî encam bidat u dû şwêniy ezmûniy mûseq mor bikat, endamanî encumeniy aşî kobûnewe bo e-vey rawej biken u hengawiy taze le beramberiy Êraq da helênin.

Lew kate da, Bexday pêtextiy Êraq le keşekiy pir tengetawî da beser debat u çawerwaniy eweye Amerîka destekî niwêy lê bi-wesênen. Cey serince hendê amadeyî bo em bare niwêye wergirâwe, wek birîniy hêliy telefon legal Urdin, herweha nirxiy dînariy Êraq is dabeziwe.

Niwêneraniy wilataniy endam giwêyan le raportekî Ralf Ekiyus girt ke serokiy lêjney pişkinîniy cekiy nawkeyî u kîmyawiy tûnakereke le Êraq. Berpirsiyaranî Amerîkayî gutyan "Hel u merckeke pir metirsîye!"

Berpîsêkiy wezaretîtiy derewe gutiy ke berêweberayeti Klinton pêy waye em heluwêstey Êraq le barey pişkinîniy cekiy tûnakereke peregirtinêkiy tîrsinake. Herweha berêweberayeti Klinton gutiy kewa sûre lesor be encamgandyî erkiy em lêjne taybete.

Ralf Ekiyus diway Kobûnewey xoy legal niwênerîi wilataniy hemise endam da gutiy kewa hewil deda bo ewey encumen rîgey bîdat taku carêkiy tîrîs rû bikatewe Bexda.

Ekiyus gutiy zor narehetim leber ewey Êraq neyhêst grûpem bitwanê dû şwêniy ezmûniy mûsek dabixat u dergayan mor bikat. Herweha gutiy "ême pêşniyarekey Êraq man pesend nekîr ke deygut ba mûsekeken helwesênen" gutiy, "ême nedebû çunke Êraq deytiwaniy em mûse-gane bibestêwe her katêkiy ke biywê" Ekiyus carêkiy tîrîs gutiy



Afretaniy Êraq le berdem dergay nûsingey UN le Bexda le 13/7 xopîşardan deken le dijî hêrişiy Amerîka. Êraq rîga nadat tipi pişkinîniy cekiy tûnaker dû şwêniy Êraqiy mor bikat ya kamirey wêne girtin legal firokekanîy da be kar bêne.

kewa: "hez dekat legal berpirsiyaranî Êraq bikewête wituwêj bo ewey nebada em tengijeye pere bisênê."

Ew şîtey şimaney lêdaniy Êraq iy liyelaren Amerîka we pitewtir dekîr ewe bû ke axêwerék be nawiy wezaretîtiy derewey Çin dayay le Êraq kird bo ewey hemû biryarekanîy encumeniy aşî

cêbecê bikat, gutiy "debê biryarekanîy encumeniy aşî mü be mü cêbecê bikrên.", herweha gutiy: "le barey ew giriftaney rûyari da ême hez dekeyin ke hemû la be aşî u wituwêj çareseryan bîyin."

Le Paris hikumeti Frensa raygeyand kewa ew biryaraney encumeniy aşî deriy kirdüm serbes-tiy culanewe u helsukewt deden be çawdêranîy UN.

Ajansiy "Royer" le raportekî xoyda basiy kird ke setan xopîşandar le rojiy 12.7.1993 da çunete berdemiy nûsingey UN le Bexda.

Le Bexday pêtextiy Êraq tîr u tengawî teşeneyan kirdûwe u zorbey danıştan çawenoriy hêrişekî kit u piriy Amerikan. Hemû ew rîyaney deçne naw şâriy Bexda kontrol krawîn u pişkinîniy tund le gorê daye. Hêliy telefoniy Êraq-Urdin ke take pêwendêkiy nêwan Êraq u dere-weye piçiraw. Le layekiy tirewe dinariy Êraqi tewawêk dabeziwe, le 61 dînar bo yek dollar ewe bû wete 71 dînar bo dollarêk.

Le layekiy tirewe ajansiy den-gubasiy komariy İslamiy le Êran raygeyand ke pitir le dû hezar derbederi Eraq lem rojaney aiwayî da geystne Êran, herweha gutiy emane be hoy herşiy re-jîmiy Êraq bo ser zelkawekanîy başûrewê rayan kirduve. Bêcge leme hikumeti Holende raygeyand ke 96 derbederi Êraqîyi wek penahende wergirtuve, em 96 kese beşekin lew 28 hezar kesey le serubendiy seri yizgarîy kwêt da le snûriy Êraq derbaz bûn.

JI ÇAPEMENIYA DERVE

The Guardian

Artêşa Marksîst ji bo dewleteke serbixwe şer dîke

Partiya Karkerêne Kurdistanê (PKK), ji sala ku damezirîye (1978) vir ve, bi pêş ve çû, ji partîyek politiki veguhîrî partîyekî bi artêş ku, 50 hezar endamên wê hene.

Ev partî, ji bo Kurdistaneke serbixwe, eve bû 9 sal e ku, li dijî dewleta Tirk şerê çekdarî didomine.

Kurdistan, welateki 495 km² ye ku, di nava ûrân, Iraq, Suriye û Tirkîye yê de hatîye parîkirin. Gelhe (Nîfus) ya Kur-dan li van welatan tevî yê Er-menîstanê 30 milyon e.

Zehîn endamên Partiyê ji bo şerê çekdarî, li başûrê rojhîlatê Tirkîye yê [bakûrê Kurdistan, (N.W.)] bi ciwarbûn e. Lé serokati li Suriye ye. Sazûmân-kar û Serokê Giştî yê Partiyê Abdullah Ocalan (APO), li Suriye ye bi alîkariya radyoyê bi fermadarê gerîla re dipeyive û

taktikan dide wan.

Partî, ji aliye aborî ve alîkariyan ji hemu endamên xwe û ji Kurdên li hawîrdorê Cihanê, nemaze ji yê Almanyayê dibîne. Gerîla çekîn xwe bi piranî ji leşkeren Tirkan distîne. Bi taybeti ji, di cerdîn qereqolan de çekan bi dest dixin.

Tê gotin ku, li Tirkîye [bakûrê Kurdistan, (N.W.)] 20 hezar gerîlayen PKK'ê hene. Ji vê hejmarê zêdetir ji milisên wê ku dikarin di demeke kurt de livbaziya çebikin, hene.

Di meha Adarê de PKK'ê şerrawestina yekalî ilan kir. Lé, di meha Hezîranê de ji ber ho-vitîyen artêşa Tirk li ser gundiyan dom kir û daxwazên PKK'ê wek, dewletek federalî, mafê wekhevîyê ji bo Kurdan, nehatin pejirandin, şer dîsa dest pê kir.

*Nişeya Wergêr

Pelçiqandina mafêniyo mirovan didome

Norwec, Welat Li ser gerdûnê her ku diçe rewşa mafêniyo mirovan xera û genîtir dibin, dibêje Amnesty (Rêxistina Mafêniyo mirovan) di rapora xwe ya 1992 yan de. Li gor ku Amnesty bi nivîskîn (belgeyê) xwe dide diyarkirin, li 161 welatan mafêniyo mirovan têr gerisandin. Di nav van welatan de Norwec ji heye, lê wek her demê dewleta Tirkîye "şerefa" rezêne pêsemînê nedaye kesi.

Li ser pelçiqandina mafêniyo mirovan Serokê Giştî yê Amnesty yê Beşa Norwecê, Jannicke Hedyerdahl Larsen dîtinê xwe wiha tîne ziman:

"Xebata me ya li ser raporê dide xuyan ku, li dijî mafêniyo mirovan pesten hovane didomin. Ev yek xemgîniyeke mezin e. Binçavkirin û cezakirin bêdarazî, îşkence, tahde, mirinê politik, "windabûn" û darvekirin gehîştiye radeyeke bîlind. Ev ji dide nîşan ku ji bo hikûmetan berjewendiyen politiki dikevin pêş nîrx û jiyana mirovan."

Di beyanata xwe ku li paytexta Norwecê Oslo, ji bo çapemeniyê li dar xistibû de, Larsen bala çapemeniyê kişand li ser rewşa mafêniyo mirovan li Ewrûpayê.

Li Tirkîye ji her aliye ve îşkence û tahdeyeke bêhempa didome; di pirraniy mirin û cangirtinan de hêzên ewlekariyê risteke mezin listin, pirranî ji li rojhîlatê Tirkîye herêma ku Kurd tê de dijin.

Li Bosnayê şerî bi xwe re êrîşen cinawîri anîn. Di dubendiyen çekdarî ku li Komarên Sovyeta berê qewimîn de, her wiha perçiqandina mafêniyo mirovan dom kir.

Li gor rapora Amnestiyê li welatên stabîl wek Almanyê, Fransê, Spanyê, Fortugal (Portekiz), Bulxarîstan û Italyayê ji rewşa mafêniyo mirovan xera bûye û çewsandina mafêniyo mirovan di form û awayeke din de xwe daye domandin. Wek; tunde û dijwartiya ku polis di karên xwe de li dijî biyaniyan bi kar tîne.

Di bin perdeya NY'ê de li Somalî qirkirin



Leşkerekî Tirk li Somalî li ber posterê Aîdîd tê dîtin ku Unîsom II, ji bo serê wî xelat daniye.

Nûçeyen Derve Di 13'ê Tîrmeha 1993 yan de li paytexta Somalî Mogadîşû bi balefirên leşkerî yê Amerîkayê ku li ser Hêza Aştiyê ya Neteweyen Yekbûyi ye, operasyonek li hember General Muhammed Farah Aîdîd pêk hat; li seriya 70 sivil mirin, 174 kes ji birîndar bûn. Hat diyarkirin ku ev operasyon bi emrê Serleskerê Tirk yê Hêza Aştiyê UNOSOM II, Çevik Bir pêk hatiye.

Ji dema ku hêzên Aîdîd di 5'ê Hezîranâ bihûrî de êrîşî hêzên NY'ê kiribûn, 24 leşkeren Pakistanî kuştibûn û bi vir ve ev bû 5 operasyonên hêzên NY'ê ku li hember Somaliyan pêk têne. Di 12, 13, 14 û 17'ê Hezîranê de êrîş biribûn ser alîgirê Aîdîd û di van êrîşen leşkerî de gelek sivil hatibûn kuştin.

Berdevkê NY'ê sedemên van êrîşan, bi armanca ji hêzxistina milis û alîgirê Aîdîd ve girê dide. Berdevkê (SNA) ittifaqa Somali ya Neteweyî Hasan Huseyîn Dîmbo da xuyan ku, ev êrîş bi ser qerageha SNA bi xwe bûye; lê heta ku yek leşkerekî NY'ê di Somali de nemîne wê şerê xwe bidomin. Berdevkê SNA'ye, Amerîka bi daxwaza domandina qirkirina gelê Somali súcdar kir.

Li hember vê êrîşê û mirina sivilan berpirsiyar û rîvebirên Amerîkayê dan xuyan ku, xemgîn bûne û bi awayeki tehdîtvarî Berkevkê Wezareta Karên Dervêh yê Amerîkayê Michael Mccury wiha avivî: "Di nav çarçoveya operasyona NY'ê de mirina hin sivilan em xemgîn kirin. Lê belê bîvê wê operasyonên bi vî rengî dîsa pêk we-rin."

Bi vê helwesta Amerîkayê ji diyar dibe ku, li gor berjewendiyen xwe di bin navê "nîzama dînyayê ya nû" de, li her deverê dînyayê gava bixwaze di bin perdeya Neteweyen Yekbûyi de kare êrîşen cihêreng li dijî mirovahiyê pêk bîne.

Wekî din pişti vê êrîşê hêzên NY'ê ku gelê Somali pê bêhnteng bûn, êrîşî rojnamevanen Rojavayî ku li wir dixebeitin kirin; 4 ji wan lînc kirin yek ji birîndar bû. Rojnamevanen ku hatin kuştin şandin Xaçaşor a Navneteweyî ya Kenyayê.

Xwestin weşana Gündemê bidin sekinandin

Di 13'ê Tirmehê de ji bo Özgür Gündemê biryara weşan rawestandinê bi destê Dadgeha Aslı ya Duyemîn a li Stenbolê hate dayîn. Qaşa sedemê vê biryarê ji ew bû ku, berpirsiyarê rojnameyê navnîşana xwe guhertiye û hêzên ewlekari jê agahdar nekiriye.

Hêzên dewletê gotin ku, ev biryar li gor Qanûnê Çapemeniyê ji benda 9'an hatiye girtin. Lî nûnerên rojnameyê gotin ku, ev biryar ji usulan der e û siyasi ye. Li gor Qanûnê Çapemeniyê, benda 23'yan cezayê vî tişti, ji 3 hezaran heya 15 hezar lîrayêñ Tirk e.

Ev biryar, bi helkirina këmasiya ku wek sedem dihate nîşandin, ji holê rabû. Gelek mirov û saziyên demokrat ev biryar wek bireyarek siyasi nirxandin û protesto kiran.

Li pişt vê bûyerê di 15'ê Tirmehê de içar Berpirsiyarê Karêñ Nivîsaran yê Gündemê Davut Karadağ hate girtin. Ev bûyer ji nîşana zilm û pêkutiyê dewletê li ser çapemeniya muxalif e.

KMM: 500 gund hatin valakirin

Şaxê Komeleya Mafêñ Mirovan ya Amedê raporekê der barê valabûna gundêñ li Kurdistanê de amade kir. Di vê raporê de tê diyarkirin ku, ji aliye dewletê ve bi "sedema ewlekariye" ji 500 i zêdetir gund hatine valakirin. Serokê KMM'ê yê Şaxê Amedê Sedat Aslantaş daxuyan ku, di vê dawiyê de, politikaya dewletê ya gundvalakirinê hîn xurttir bû. Bi koçkirina gel ji gundan, nîfusa Amed, Batman û Çukurova dûbar bûye. Di raporê de tê diyarkirin ku, herî zaf gundêñ li ser Şîrnex û Amedê têñ valakirin û ev kar bi zordestiya hêzên dewletê pêk tê.

Bi taybeti pişti xerakirina biryara şerrawestinê ku PKK danibû, serê di navbera gerîlayêñ ARGK'ê û hêzên dewletê de dijwartir bû. Dema ku gerîla erîsi avahî û hêzên leskerî yê dewletê dikin û ew dixesirînin, hêzên leskerî yê dewletê ji, berê xwe didin gelê sivil û ew bi darê zorê ji gundêñ wan koçber dikin.


Hêrsa karmendan

Nüçeyen Derve - Li gelek bajarêñ Tirkîyê û Kurdistanê bi deh hezaran karmend (memûr) ji bo hindikbûna zema mieşen xwe xwepêşandanen protestoyî pek anîn. Li Enquerê polis mudaxaleyi xwepêşandanvanan kir, ji panzeran ava bi tazyik ji bo belavkirinê, li karmendan hate reşandin.

Karmend di 15'ê meha Tirmehê de li bajarêñ Tirkîyê, Stenbol, Enqere, İzmir, Edene, Mersin, Kutahya, Edirne, Samsun, Giresün, Rize, li bajarêñ Kurdistanê ji li Diyarbekir, Mardin, Rûha, Dîlük (Enteb)’ê bi awayen celeb bi celeb protestoyen xwe pêk anîn. Li hin devaran % 80 beşdarî çebû, meşyan rojek, nivroj dev ji karêñ xwe berdan, boykota nanxwarinê li dar xistin û xwepêşandanen çekirin.

Hemû karmend zema ku ji alye hikûmetê ve li mehmiziya wan hatibû kiranê hindik dîtin, daxwaziyen xwe yê "mafê sendikaya bi peyman û bi grevî" anîn ziman. Li Enquerê ji disa bi van daxwazan 15 hezar karmend meşyan meclise.

Her wiha karmendêñ ku di



Karmend protestoyen xwe yê li hember hikûmetê bi awayen celeb bi cel eb pêk ani.

kar û barêñ dewletê de dixebeitin ne tenê ji bo mafê xwe, rôexistinkirinê û zema hindik, ji bo rê li ber arizîkirina kargeh û fabrikayen dewletê were girtin ji, hel-

westa xwe diyar kiran.

Karmend nawxazin ku karistan û kargehêñ dewletê derbasî destê şexsan bibe. Lewre ew karsgehêñ ku berê di destê

dewletê de bûn û pişt re ketibû deste kesan, karker û xebatkarê wan an jê hatibûn avetiñ an ji bi mehiziyeke geleki kêm têne xebitandin.

Kurd ji herêmên Tirk têne avêtin

Navenda Nüçeyan - Li bajar û navçeyen Tirkîyê êrîşen li hember Kurdên niştechididomin. Kurdên ku ji ber zilm û zora hêzên dewletê ji welatê xwe direvin û li navçe û bajarêñ Tirkîyê bi cih û war dibin, bi hin provakasyonan ji van herêman ji têne qewitandin. Êrîşen bi vî rengî, gelek caran bi hin sebebêne siyasi dest pê dikin û dû re bi navlêdanen hin hêzan reng diguherin û dibin êrîşen bi giştî.

Dewleta Tirk, li hember êrîşen wiha bêdeng dimîne, gelek caran ji ew bi xwe êrîşen wiha organize dike da ku bikaribe ji bo şerê xwe yê li Kurdistanê, desteka gel bigire.

Navenda Nüçeyan - Partiya Keda Gel (HEP), pişti mehkemekirineke dûvedirêj, bi biryara Mehmeyea Qanûnê Bingehîn roja 14'ê Tirmehâ 1993'yan hate girtin. Biryara girtina HEP'ê ji aliye rayedarêñ parti û gelek hêzên din ve weke biryareke politik û anti-demokratik hate nirxandin.

Bi girtina HEP'ê re, mebûsiya Serokê Partiyê yê kevin Fehmî Isıklar ji ket. Fehmî Isıklar niha mebûsê SHP'ê ye û cîgirê serokê parlementoya Tirk e. 18 mebûsên HEP'ê ji ber ku beriya vê biryareke ji partiya xwe hatibûne ixraçkirin û derbasî DEP (Partiya Demokrasiyê)’ê bûbûn, ji mebûsiyê neketin. Lî li gelek xeletiyan kir.

dan ji Ezîneyê biavêjin" û hwd. dixwazin otelê bişewitînin. Polis pişti bi demekê xwe digihîne

otelê û li şûna êrîşkanan 4 xebatkarê Kurd digire û binçav dike.

Çapemeniya Tirk û nüçeyen bêbingeh

Di 14'ê Tirmehâ 1993'yan de li Girtîgeha Sağmacılar girtiyen siyasi yêñ jin ji bo ku 12 Tirmehê bi bînîn, ji idara girtîgehê ïzin xwestin. Idare daxwaza wan qebûl nekir. Ji bo protestokirina ïdarê, jinêñ girtî yêñ siyasi biser qawîşen merañ ve girtin û sloganan avêtin.

Çapemanî û televizyonen Tirk ev bûyer berevajî kirin û xwestin weke daxwaza bi hevrebûna jinanî û merantî (zayendi) nîşan bidin. Dozgerê Girtîgeha Sağmacılarê Muzaffer Înanlı, nerastiya nüçeyen çapemeniyê diyar kir.

HEP hate girtin

endamên HEP'ê yêñ ku heta 3'ê Tirmehê endamê vê partiyê bûn, siyaset li wan heta qedexekirin. Di nav van qedexekirian de, mebûsê HEP'ê yê kevin İbrahim Aksoy û serokê HEP'ê Ferîdûn Yazar ji hene.

Serokê Partiya Demokrasiyê Yasar Kaya, li ser girtina HEP'ê wiha axivî: "HEP ji bo mafê mirovî yê Kurdan hatibû damezirandin. Di platformen demokratik de, dengê gelê Kurd bû. Di pêvajoya jiyanâ xwe de gelek xeletiyan kir.

Lê divê em çeyiyen wê ji bîbêjîn. HEP'ê gelek karêñ girîng û birûmet ji pêk anî. Mîna sahiyên Newrozê, mîna serhilînan, mîna beşdarîya şîn û sahiyên gelê Kurd û xwedî lederketina cenazeyan.

Girtina HEP'ê ji aliye me ve xuya bû. Ji ber vê yekê Partiya Demokrasiyê hate dameziran din.

Lê birayar girtina HEP'ê kifs kir ku, li Tirkîyê demokrasî nîn e.

Bi vî qanûnî heta niha 4 parti

hatine girtin. Sebebê girtina hemûyan ji pirsgirêka Kurdi ye. Pişti vê biryareke kes nikare bibêje Kurd bi serbestî û azadî, dikarin pirsgirêka Kurdi bi lêv bikin. li platformen demokratik partyan damezirînin û werin parlamentojê. Ev rê li ber me hate girtin. Em di welateki wisa de dijin ku, gelek rojnamevanen Kurd û Tirk, hê ji di zindan de ne. Qanûnîn 12'ê ilonê giş li cihê xwe diseokinin.

Riya parlamentojê, siyasetê û riya xebatên demokratik li ber gelê me bigirin, riyeq tenê li ber me dimîne; ev ji her kes dizane ci ye. Lê divê em dev ji têkoşîna bidestxistina qadîn demokratik ji bemedin."

Êsa Kewa Gozel

M. Keşkan

Hevdeh salî bû. Porreş û çabbelék bû. Evîna dê û bavê xwe bû. Niha dicû lîseyê. Bîboka pûleyê (sınıfê) bû. Bi alîkariya dê. nîvîskarêñ xweş dinîvîsand. bala mamoştayê dikîsand. Serbixwe bû. Çawa dixwest, wer diliví.

Di malbateke dewlemend û ronakbîr de hatîbû dinê. Dê mameste, bav bijîşk bû. Dersfetên malbatê fireh bûn. Di hebûnê de li gor xwe bêyi xem û xeyalan mezin dibû. Dilovan bû. Di civatê de, di nav hevalan de, di dilan û xwesiyan de, di şevan de gul bû. Bi kena xwê, bi henekên xwe, bi pêkenok û qerfên xwe wekî sosi-na biharê vedibû. Gulbihar bû.

Li ba wê jiyan hêsan dixuya. Gelş û pirsgirêk nebûn. Keder û keser tune bûn. Çima hebûyana? Bav navdar bû. Di nav hevalên xwe de Bijişk Beg bû. Xwedi rûmet bû. Her roj bisedan kes liber dest girê didan. Jê alîkarî dixwestin. Ew bûbû "Yezdanê alîker". Dê hem mamoste bû, hem jî jina Bijişk beg bû. Dema dihat civata jinan. hemûyan ji hev re digot. "rabin jina bijişk beg té". Neheq jî nebûn. Jneke jîr û xwenda bû, zanîbû ci dibêje. Bûbû jînrêber. Rê ravê jinan dikir. Di malbateke wiha de keça Bijişk Beg û jînrêber gelek caran ev gotin dibihîstîn: "Keça me ya delal. rindik û jîr! Pêseroja te ronak e. Tu dixwînî. Malbata te dewle-mend û xwedi jêderên fireh e. Tu qîza ronakbîrêñ navdar î. Tu rind î. Cavêñ hemû malbatêñ navdar û dinyaditi li ser te ne."

Bi rastî jî delal bû. Rind bû. Bejinzirav, porreş û rûtenik û rêxweş bû. Kewa Gozel bû. Ciwan û bedew bû. Qelafeteke titâli ser bû. Dema di rê de diçû wekî prenseşen sawêr dixuya. Çav ecêb diman. Rindi û delaliya wê bala gelek kesan kişandibû. Piranî jî yê civata der û dora wê. Civata dewlemend. Civata qeymeqaman, dadgeran, dozgeran, serbazan, film û şanoçekeran, bijîskan, mihendîzan, fabrîqetoran.... Civata "pêşverû û dûrbînan". Civata çîna birêvebiran. Civata "stêrkan". Stêrkên bajêr.

Malbata wê malbateke malava bû. Mala nan ú avê bû. Deri ji her kesî re vekirî bû. Berdesten wan hebûn. Kesên bi nav ú deng dihatin mala wan. Dî rojên taybetî de carina qorek radibûn. qorê din rüdinist. Malbat malbateke sosyal bû. Sev cêdirik, dilan cêdirik, parti li dar dixistin. Di van sev ú partivan de civata "ro-

van sev û partîyan de civata "ronakbîran" kom dibû, sohbet dikir. Sohbetan civat germ dikir; ji jiyana rojane bigire heta rewsa politiki, roman, film, sano her tist bi këf û henekan dihat leckirin. Sifre hazir dibû, celeb celeb xwarin û vexwarin pêskêsi besdaran dibû. Bijisk û mamoste bi fêza amadekirina sev û partîyen wiha bi mîvanan re diketin axaltimên kûr û bêdawî. Der barê xwe, vê jiyana keca xwe, vê ci-

ran û hevalan de diketin leckirinan. Ew di leckirinê xwe de ve-kirî bûn. Li gor wan divê mirov her tiştî bi awayekî vekirî bipeyi-ve.

Di şevênilan de Kewa Gozel jî. ji her celeb gelş û gelemşeyan dûr. geh di bingeha muzîka rockê. geh di bin melodyên klasikî. geh jî di bin muzîka giran de direqisî. ci maharetên wê hebûnî diavêtin holê. Di bin reqsê de porê res û dirêj geh ji ser milê rastê geh jî. ji ser milê cepê di çû- dihat. Kewa Gozel di sohbetên xwe de behsa jiyana xwe evîna xwe û hwd. dikir. Dê bêkêfxweşîya keça xwe ya xweşîki dilovan dibû. Dilovaniya wê bêşahiya rûkeniya wê ve xwe dida dest. Wê di ramanên xwe de pêşeroja keça xwe di nav yekî dewlemedî û dînyadîfî de xeyar dikir. Ew ketibû xewnên pêşeroja dîlbera xwe. Dîlbera cîpdirêj û navtenik. Kê ji bo qîzên xwe nediket xewnên wilo? Xewnên ba lefirvanek. bijîskek. serbazek an ji dadqerek. ...ek. ek. ek.

Dawîya dema perwerdekirinê hatibû. Dem dema îmtihanen bû Xwendekarêna sala dawî ya lisê diketin îmtihanen kutanê Dersên psikolojî, laşê, dîrok, matematik û hwd. Kewa Gozel li o da xwe dirêj bûbû, di ber pirtû kan de ketibû xeyalên kûr û dirêj Ji nişka ve mêt bi gelemşan tije bûbû. Xwendin giran dihat. Pir-

*Bi rastî jî delal bû. Rind bû.
Bejinzirav, porreş û rûtenik û rêxweş bû.
Kewa Gozel bû. Ciwan û bedew bû.
Qelafeteke tîtal li ser bû. Dema di rê de
diçû wekî prensesên sawêr dixuya. Çav
ecêb diman. Rindî û delaliya wê bala
gelek kesan kişandibû. Pirranî jî
yê civata der û dora wê. Civata
dewlemend. Civata qeymeqaman,
dadgeran, dozgeran, serbazan, film û
şanoçêkeran, bijîşkan, mihendîzan,
fabriqetoran,... Civata "pêşverû û
dûrbinan". Civata çîna birêvebiran.
Civata "stêrkan". Stêrkên bajêr.*

tûkan giran dixuyan. Feyda alîka
riya dê nemabû. Dubendiyêr
mezin peyde bûbûn. Di mêtê de
ramanên ji hev cuda ketibûn se
reki giran. Mejjî bûbû qada hêzêr
ku bi hev re pevdicûn. Xeyalan
dest pê kiribûn. Ew rastî tîra e
vînê hatîb. Evîna ku dilan diêşî
ne, singê teng dike. hêzê ji mirov
diîzîr meccelâ nabiîline.

digire, mecele naneine. Evîna xortekî ciwan û qendebû. Xortekî nerm û baş, bi ken û beservekir, lê ji xwe bêbawer. Jî malbateke belengaz û pêxwas dihat. Toreya aqademîsyentiyê tûne bû. Xwe di hawîrdoreke xerîbû û nenas de ditibû. Civata nû û hawîrdora dewlêmend ji wî re biyanî dihat. Wi xwe di vê hawîrdorê de bicûk û bêhêz didit. Nedizani ew dê cawa bilive. Bébirvar bû. Lî ser xwe nikaribû birva

ran bigire. Xwedî kesanetiyeke
nezelal bû. Pêwendiyen wî yên b
Kewa Gozel re kesanetiya wî yên
nezelal, derxistibû holê. Keçikê
ew wek zarokek didit, lê jê hez j
dikir. Lawik di jiyana keçikê d
bûbû xwedî ristek, lê risteke ç
wa?


Kewa Gozel ki bú? Wé ci dix west? Di rewšeke çawa de bú? Erastí ne zelal bú. Di ımtihané xwe de bi mafé xwe bi ser neke titüb. Gelek cefa ú tade kişandibü. Cira malbata ronakbır vemirî bú. Tu daxwazeke wé ji bi cih nehatibüb. Lé malbat disa ji bi aram bú. Kewa Gozel tenê bú ú zéra malé bú. Ji bo ku ew bi serkevemalbaté fedakariyén mezin pèwest didif. Mamosteyên taybet hatibûn girtin. Serokê lisê hatibe ditin.

Destpêka payîzê bû. Îmtihan
hatibûn dayîn. Kewa Gozel dila
nekê amade kiribû. Heval û ho
girên nas vexwendibûn. Dixwes
serkeftina xwe, dilovaniya xwe b
kêf û şahiyan pîroz bike. Vex
wendar kom bi kom rûniştibûn (serî
avêtibûn xwarin û vexwa
rinê. Dinya wan dinyayeke ser
bixwe bû. Ew hay li dinya der tu
ne bûn. Li der sar bû, agir dibari
ya, mirov dihatin kustin, dayik di
giriyan, dawiya dinyayê dihat, di
xema wan de nebû. Kewa Gozel
xwe di vê dinyê de jîndar û dilge
didit. Evîna xwe difikiriya. Evîna
ku dilan ges bike. mejiyan mijû

al bû. Rind bû.
rûtenik û rêxweş bû.
iwan û bedew bû.
er bû. Dema di rê de
n sawêr dixuya. Çav
û delaliya wê bala
andibû. Pirranî jî
dora wê. Civata
ta qeymeqaman,
n, serbazan, film û
skan, mihendizan,
Civata "pêşverû û
çîna birêvebiran.
". Stêrkên bajêr.

dike. Evîna reş! Büye balyayê serê
wê. Ew êsandibû. kurmîzar kiri-
bû. Lê niha. Niha: di vê keliyê de-
dilê wê wek saetê lêdixe. Baskê-
wê hebûyana. ew dê wek goger
cînê biketa asîman. xwe bida be-
bayê û bi vê gesbûniyê bifirîya-
heta dawiya dinê. Cîma?

Evîndarê wê. Evîndarê ku wê
bi şev û rojan di mejîyê xwe de
xeyal dikir. ji ber janê ranediket
tehli dikişand; îsev li wir bû. Li
ber cavêن wê bû. Wê ew bû
cavêن xwe didit. bi guhêن xwe a
wazén wi dibihist. bêhha wi diki
sand kezebên xwe.



dili bün. Dixwest hundirê xwe vala bike. Ew giraniya ku li wê si war bûbû, biavêje; barê xwe sivi bike. Lê, bar giran dibû. Dawiy dilanê ne bi xêr bû. Pêşeroj tarî biêş û janê dixuya. Wê vexwar bû û bi temamî di hisê xwe di nebû. Di rewşêke wiha de meka nîzma xwekontrolkirinê wind bûbû. Hêzên tarî di xebatê di bün. Hêzên ku li rojêن bi dûxanî li du néçirê ne. Kewa Gozel gogerçin, ji gewhera dê û bav xwe ketibû daf û kemînên neyan. Gelo wê xwe nexwestibû?

Nexweşî û êşan dest pê kir bûn. Èşen ne laşî, lê yên giyan ew çarmedor pêçandibûn -we ku bifetisînin. Şeva dilanê bûbê şeveke trajedi û dramatik. Keçî di şeva dilanê de vîna xwe windî kiribû. bi mamostayekî pêncî sal re mabû û ji vê raketinê ji avi mabû. Malbat bi bûyerê hesiya bû. Ji bo zarok girtinê xwestibûn keçikê qanî bikin. Lê bi ser neketibû. Keçik biryardar bû. Nedix west bibe mirovkuj. Dixwest bibe xwedi pitikê. Kî dizane dibe kî dilovanî di vê yekê de bû?

Di malbatê de bêdengiyek her
bû, lê ev bêdengî dexela (elame-
ta) xêrê nebû. Dexela xemgîniy-
bû. Li ser malbatê tirêjên rojê ve-
miribûn. Ji jiyana jîndar û zînd-
berhemek nemabû. Li holê heva-
û dostêr rojên fireh nedixuyan.
Kesekî xwedixêr derî venedikin
Daxwaz û hêviyên pêşeroj bi mi
amelê re ketibûn têkosomeke xe-
dar û têk cûbûn. Cihê këfî û sahi-
yan xemgîniyê girtibû. Girêkê
Kewa Gozel her diçû zêde dibûn
Jan û êş ên tehmulkirinê nebûn
Dayîkbûna Kewa Gozel ew ji kri-
za kûr a giyanî xelas nekiribû.
Ji Kewa Gozel re nexwesxan

bûbû mala duyemin. Dinya wê teng dibû. Mejiyê wê bi kul û ke-deran tije bûbû. Dilovanî, xemgi-nî, jan û êşen alozî bi hev re keti-bûn bezê. Bezeke bêdawî. Dawi-ya eşqa dilgeşiyê dihat. Eşqa reş! Eşqa ku ew avêtibû nav agir û bayê. Agirê ku dilê wê şewitandibû: pizotên sor peyde kiribûn. Eşqa tîrêjên rojê. Heta ji wan tûj û dijwartir. Tîrêjên rojê ku berfa ciyayê Araratê dihelinin. Hesin û kevir di bin germiya wan de dihelin. Bayê sar û nexwêş! Bayê ku dilê wê yê xas semitandibû, kezebêñ wê şewitandibû. Ew kiri-bû sivik û bêhêz. Niha herduya ji hêza xwe winda kiribû. Vemiribûn. Xwe kişandibûn qulên xwe. Kesek hay ji wan tune bû.

porreşê: heyfa te tu çawa ji canê xwe bêzar bûbûy. Ew canê delal û xwesik. Te çawa ew girtibû?

Bûbû qurbana xwenaskirinê. Qurbana taybetiyê psîkolojik. Bûbû qurbana fikrandina logîki û rasyonel. Bûbû qurbana giyaneke ziwa û dewlemendiyek bêxêr. Di hawirdoreke çekirî de ajne (melevan, soberî) kiribû. Kesanetiyeke çekirî listibû. Raman û îdealên xwe temsîl nekiribûn. Di nameya ku li pey xwe histibû de gotibû: "Xwezî min wek Gulşînê bikira. Ji min re gotibû "Kewa Gozel tu bi hebûna xwe diliżî. Were besdarî doza me bibe" Ez dizanim ew niha qevdikê modelê di dest de di qûntar û kendalên ciyayên azadî de. îdealên mirovatiyê diparêze. Min biborînin! Ji min cû: jiyan li min teng bûye. Hebûn û nebûna min yek e. De di xwesiye de bimînin." Gotinên wê yên dawi bûn. Kewa Gozel a gogercin cûbû dilovaniya xwe.



Jiyana bêr met her roj mirin e!

Ali Çiçek

Jiyana bi tirs dojehe

Li gundê dor bajarê Si-tawrê eşîra Direveryan heye. Di dîroka gelê Kurd de vê eşîrê li hemberê leşkeren Mistefa Kemal berxwedanek û serhildaneke dijwar danîne, gelek mirovîn wan şehîd ketine, gelek jî leşker kuştine. Piştî sala 1984'an ku şerê rizgariya neteweyî dest pê kir, li vê herêmê jî serdestiya gerîla û ya dagirkeran dem bi dem dihate guhertin. Berî s a l a 1990'an qo-mutanê gerîla hevalê hêja Kamuran Dündar û 14 hevalên xwe li Girê Şera şehîd bikevin, hingê ew herêm azad bûn piştî ku heval şehîd bûn dijmin şerekî taybetî da destpêkirin. Li hember vî şerî, li hemû Kurdistanê

serhildanen desî pê kir.

Wî wextî li gundekê Direveryan, mirovekî niha serleskerê cerdevana ye, berî ku bibe cerdevan rojekê diçe nav par'zê (bos-tanê) xwe, zebeşê we bi-

dibêje; "Lahewlalwela ci ye îca." Baş raman îke dibêje: "Wele gerîla nehatiye nav parêz dewsa niyê wan tune û parêz jî turar nedîtiye, îca ev ci nesele ye? "Qederekê di nav parêz de diçe û dixe-bite, carekê li pişt xwe dizivire û dinêre ku lawikê wî ze-beş hildide, li ser bi kevir PKK dinivîse û zebeş serî-qûn datîne, bavê wî di-çe, zebeşê radike û dinêre dibêje: "Te ev ni-vîsandiye?" Lawik jî d i b ê j e : "Belê" Bi lawik re dixe-yide. Lî belê bila paşverû

lind dike û bin wan vedide û di wan çalikan de datîne. Lawikê wî 12 salî heye û pê re ye. Zilam ci zebeş hildide û dinêre li ser PKK ni-vîsandiye, ditirse û difiki-


hemû zanibin ku dê rojekê ji zarokê xwe jî bitirsin. Jiyana bi tirs dojehe (cene-me) e. Jiyana bêtirs, jiyana azad e.

Azad Şérîn

Jûjî...

Doğan Güzel

HÊZEN LESKERÎ YÊN TIRK
JI BO SERE TAYBETÎ JIGAR
EMENNE ALIKARTI XWESTIN.



TİR

Musa Anter



Nalîna min

M eha Îlonê. Roja şemiyê. Serê sibehê zû. Ba û bâhozeke tûj û tund. Tê de nişana hatina demsala zivistanê. Ewrên tarî, ronahiya aşiman girtine. Xweza ci livê de ye. Hebûna jîndaran, xuşe-xuşa newalan û herikîna avên çeman. Leqîn û hejîna daran. Dengê erebe û însanan. Li kolanen bajarê Trondhjem Norwecê, tevlîhevûna rengê hezeran. Qêrin û qerebalixeke bêqiyas. Mejî bi xem û xeyalên welat tije.

Di wextekî wiha de xebereke bi êş û xedar belav bû. Digotin stûnâ dîrok û çanda Kurd Apê 70'ê salî, şerê serê çiyan, penûsa ramanen hêja hatiye kuştin.

Çipêni kestî, xwîna sekînî, çavê matmayî. Ji aliye din ve ramanan bi xem û xeyalan. Gelê Kurd berhemeke giranbuha wînî kiribû. Nê tenê gelê Kurd, her wiha gelên Rojhîlatê jî. Dila dixwestin şînê girê bidin, heyâ dikarin bigirin. Lî kelîn û girî i tenê dikare dilreşan şâ bike, kezebêن wan ên reş û pintî bikewîne.

Divê ne şîn û girîn, lê domandina felsefeya Apê Musa: In-cax ew dikare neyar û bêbextan bifetisîne. Xwînxwaran çîma ew kuştin? "Sûç û xetayê" wî ci bû? Tiştên ku wî digotin û dinivîsin vekiribûn: Aşti, dada cîvâki, azadiya ramanan, parastina gelan û mirovan. Jiyaneke xweşik û paqîj. Gelo bêyi dilreş û mirovkujan, kî jî van xwî dike.

Dramatîkerê Norwecîyan Îbsen dibêje, "Ger mirov derewen jîyanê ji yên ku jiyana xwe li ser wan derewan li dar xistine, bigire wê bibe sedemê jiyangirtina wan."

Sedema qetla Apê ronakbîr jî ev bû ku, wî bi zimanekî xurt û zelal derewen van mirovan derdixistin holê û didan ber çavên gelan. Pirritîn jî gelê Kurd. Perde û tora li ser derewan radikir. Bi tenê ew tişt dikirin. Ev jî, jî bo çavşoran, ên ku di kîliyek de dikarin cîhanê bikin qurbana wan derewan xwe, baş bes bû.

Kî dibe bila bibe; kedxwarêñ Tirkan, xayîn û xwefiroşen Kurdan û neyarêñ mirovahîyê her roj ku, diçün dibûn dijinîn wî yên xedar (ez dibêjim neyarêñ wî, lê hûn wan wek neyarêñ hebûnê bizanîn).

Apo te bêhna wan teng dikir, sebra wan diçikand. Wan pere kirin berikêñ ajanêñ peregirtî yên çavşor û li pey te şandin nêçirê. Gotin: "Herin vî dewrêşê porspî bipelçiqînîn. Wî mala me şewitand, rewşa me wêrand. Ger ew bijî, wê xelk hay ji hemû rûreşî, sosretî û qirêjîyê me bibe. Wê çaxê em dê bêhtir rezîl û riswayê alemê bibin."

Rêberên nandozan digotin; "Serek piranek." Ew jî geşta xayînan bû.

Apê Musa tu dizanî her demê ku bêhna kedwaran diçike ew zêdetir xeta dîkin û xwe súccdar dîkin. Çûyîna te jî, jî bo wan bû xetayeke mezin. Wan bi kuştina te dixwestin doza te ji holê rakin û bêhneke fireh bigirin. Lî behna wan niha zêdetir diçike. Te di dilen wan de gurf û tîrsen xedar pêk anî. Qedrê te jîxwe bilind bû, lê hê jî bilindir dibe. Gelek Kurd, Ecem Tirk, Ereb, Ewrupî tu nedinasin. Lî niha deng û qedrê te li ser dinya me seranser belav dibe. Qurfa neyaran jî ev e.

Niha pênuşan derya tije kirine erd û aşiman jî bo te dilorîne. De tu bi keremiya xwe destûra min bide, ez dê bikim ha-war, stûyê cinawiran bikim xwar.

Gavan Koçer

Hikûmeta nû çareserkirina pirsgirêka Kurdi teslimî artêşê kir

Hêviya astiyê vedimire

Nûçeyên Derve- Dewleta Türk, bi piştgiriya Amerika û dewletên Rojavayê, ji bo tunekirina serhildan û têkoşîna Kurdi. bi hemû hêza xwe ve dest bi politikayeke qirkirin kir. Ev program bi biryara Heyeta Ewlekariya Dewletê (MGK), ji aliye hikûmeta nû û bi piştgiriya partiyen din tê meşandin. Serokwezir Tansu Çiller, li ser ferma na leşkeran, ji bo ji partiyen din jî piştgirî bistîne, serlêdanen dorfirî pêk anî. Partiyen ANAP, MHP, RP, CHP û partiyen din ên biçûk, desteka xwe ji bo vê programa qirkirinê pêşkêş kirin. Tansu Çiller, bi mebûsen DEP'ê re ji hevdîtinek pêk anî. Lî ev hevdîtin bêhtir ji bo pêkanîna formalîteyê bû.

Li gor vê bernameya ku ji aliye leşkeran ve hatiye amadekirin, bi xwedî û berpirsiyaren çapemeniyê re ji civîn pêk hatin. Di van civînan de, generalan nûneren çapemeniyê tehdît kîrin, da ku li dijî agahdariyên ku leşker didin tu tişt neyê weşandin. Çapemeniya rengin a bûrjûwaziyê, weke her carî serê li ber leşkeran tewand û li gor ferma generalan rengê xwe ji nû ve guhertin.

Amadekariyên hikûmetê û hêzên leşkerî nîşan didin ku, dê

● Bernameya ku ordiya Türk li ser pirsgirêka Kurdi daye ber hikûmetê, bernameya mirinê ye. Armanc weke her carî, vê serhildan û têkoşîna rizgariyê ji, bi qetliaman tunekirin e. İro li hemû deverên Kurdistanê, ev qetliam bûne xalêr rojane. Dixwazin hê jî berfîrehtir bikin. Lî, nabînin ku gelê Kurd weke berê bêbawerî û bêhêz nîn e. Ev serhildan ji, bi qetliaman têk naçe.

Li gor vê bernameyê qetliamên dorfirî û girseyi pêk werin. Büyerên bi vî rengî, li Kurdistanê xwe zû diyar kirin û li hember bajar, navce û gundên Kurdistanê, êrşen hêzên leşkerî dijwartir û barbartir bûn. Li hember Cizir û Gihadînê provayên qetliamê pêk hatin, li bajar û navçeyên din jî operasyonên dorfirî didomin.

MGK KONTROLÊ DIGIRE DESTÊ XWE

Heyeta Ewlekariya Dewletê (MGK) ji bo kontrola dewletê bi temamî bigire destê xwe, ope-rasyoneke dorfirî pêk anî. Ev operasyon ji roja ku hikûmeta nû hate ser kar, di rojevê de bû. Hê beriya ku hikûmeta koalisyonê ji Meclisê "raya ewle-bûnê" bistîne, general bi ser meclisê ve girtin û bi Tansu Çiller re hevdîtinek pêk anîn. Ar-

manc rîlibergirtina programa hikûmeta nû bû. Lewre di programê de, ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurdi hin mafêñ çandî û demokratik cih digirtin. Pişti ku hikûmet dest bi kar kir, qala vê programê nehat kirin. SHP bi temamî deng ji xwe birîbû û ji cehpeya muhafazakan jî, her diçû beyanên tûjtir dihatin kirin.

Pişti serdana generalan, Tansu Çiller programa reformen demokratik danî aliyeji û bi devê generalan ji bo tunekirina doza Kurdi beyanên bi xwîn dagirtî, belav kir.

General, tenê bi kontrola hikûmetê jî qayîl nebûn. Diviyabû hemû partiyen din û çapemeniyê ji bixin bin kontrola xwe. Ji bo vê jî, roja 12'ê Tirmehî li Enquerê, bi serokên partîyan û hikûmetê re civînek pêk anîn û ferma xwe ji wan re xwen-

din. Dora rojê, bi xwedî û berpirsiyaren rojname, radyo û televizyonan re ji civînek pêk anîn. Ji wan re ji wezifeyen wan xwendin û tehdît kîrin, da ku ji bin emrê ordiyê dernekevin. Di civîn de, ji rojnameyên Özgür Gündem û Aydinlikê tu kes nîn bû. Lewre general ew wek rojnameyên neyar dinirxandin.

ARMANC QIRKIRIN E

Operasyona generalan, bi yek armanceki pêk tê; ew jî tunekirina têkoşîna Kurdi ye. Ji bo vê jî programek bi xwîn amade kirine û ev program niha li Kurdistanê tê meşandin. Artêşa Tirk hemû hêzên dewletê kontrol dike û ji bo meşandina vê programa qirkirinê bi kar tîne.

Çiya, newal, bajar û gundên Kurdistanê bi bombebaranen balefirin û bi dengê çekën giran dihejin. Li Gihadîn û Cizirê provayen hilweşandinê pêk hatin. Hemû deverên din jî, di bin vê tehdîdê de ne. Programa hêzên leşkerî guheriye. Niha dixwazin PKK'ê ji desteka lojistik mehrûm bîhelin. Lewre di şerê bi gerîla re bi ser neketin. Niha dixwazin kaniya wê biçikînîn. Bi vê armancê jî, gundên di qûntarên ciyayan de tîne va-

lakirin û hilweşandin. Li bajaran jî, li hember welatparêzan operasyonen bi gişî têne meşandin. Di van operasyonan de, bi sedan Kurd têne girtin û zîndanî kîrin.

"LI TIRKIYÊ PIRSGIRÊKA KURDI NÎN E!"

Bi vê operasyona generalan re, li Tirkîyê şeklê bilêvkirina pirsgirêka Kurdi jî guherî. În ku heta doh, ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurdi, reformen siyasî û çandî didane pêş, iro dibêjin "Li Tirkîyê pirsgirêkeke Kurdan nîn e. Emê PKK'ê tune bikin û ji wê û pê ve tu pirsigirê nemîne."

Niviskar, rojnamevan û rewşenbîren ku, ji bo dîalogek di nava PKK'ê û dewletê de dest pê bike dixebeitîn, iro bêdeng in, qutufine û serê xwe ji qalîken xwe dernaxin.

Bi vî awayî jî, general ji xwe re qadeke vala peyde kirin û çawa bixwazin wisa dilîvin. HEP hate girtin, deng ji tu kesî derneket, xwestin ku Özgür Gündemê bigirin, ji xwe nenivîsandin û general bêyi ku muxalefetek li hember xwe bibînin, rejîma faşist xurttir kirin û hemû hêviyên demokrasiyê têk cûn.



Samî Abdulrahman

YEKGIRTIN hev negirt

Seyid Çiya

Li Kurdistanâ Başûr, pişti Yekîtiya Nîştimanperweren Kurdistanê (YNK) û Partiya Demokrat a Kurdistanê, hêza mezin Partiya YEKGIRTINa Kurdistanê ye, ku bi navê YEKGIRTINê tê naskirin. Li Başûr jêderk û kana hemû teveren neteweyî yek e. Ev tevera ku ji sala 1940'î de dest pê kiriye, di dîroka xwe de hîneq vejetin û qonaxên gelemşeyî bîhurandiye.

Cawa ku PDK û YNK ji hev û din zêde bûne, pişti sala 1975'ân ji ev zêdehî YEKGIRTINê ava kîrin. Sê partiyen Kurdistanî di dîroka nêzîk de ji ber hîn sebebîn siyasi û eşîrî ji PDK û YNK'ê vejetiyan û bi navê YEKGIRTINê hatin ba hev. YEKGIRTIN ji niha hatiye dema xwe ya dawîn û li benda roja ku di nav PDK û YNK'ê de bê parkirin maye.

Li Kurdistanê li ser vejetin û belavbûna YEKGIRTINê nêrinê wisa tê kîrin: Di nav PDK û YNK'ê de reqabetekî siyasi heye. Herdu partî ji li dijî hev, şerê xurbûnê dikin. Ew ji bo berjewendîyen xwe dixwazin YEKGIRTINê parce û tevî xwe bîkin. Armana wan ew e ku, li Kurdistanê du partî hebin, yek rast yek

çep. Zêdetirî du partîyan tu partî nemînin. YNK û PDK dixwazin li hemberî dînyayê dîmeneke yekîtiya nav tevgeren Kurdi nîşan bidin. Ji ber vî awayî zêdeyî xwe naxwazin partîyek din hebe.

YEKGIRTIN halê hazır partîyek derveyî hikûmetê ye û ji PDK û YNK'ê re muxalîf e. Lewma hikûmet alîkariya resmî bi YEKGIRTINê re nake û dixwaze rî li ber xebatîn wan bigire. Di nav serokatiya YEKGIRTINê de gelemse heye. Ev gelş û gelemse YEKGIRTINê dibe vejetandîn û armana PDK û YNK'ê li hemberî YEKGIRTINê nêzîk dike.

YEKGIRTIN di sala 1992'yan de hate avakirin. Di nav Bereyî Kurdistanî de jî cih digire. YEKGIRTIN: Ji yekîtiya Partiya Demokrat a Serbixe ya Kurdistanê (PASOK). Partiya Demokrat a Gelê Kurdistanê (PGDK) û Partiya Sosyalist a Kurdistanâ Iraqê (PSK-I) hate holê. Bi serokatiyeke pişkar (kolektifi) tê birêvebirin. Sazûmankarî partîyê Serokê PGDK û Samî Abdurahman e. Di nav YEKGIRTINê de rewşa vejetîne heft meh berê dest pê kir. Di partîye de bili Samî Abdurahman, bandora (tesîra) Resûl Mamend. Mula-

zim Sîvan, Dr. Mahmûd Osman û Abdula Agrîn heye. Li ser YEKGIRTINê, cara pêşin pêkutiya siyasî bi destê YNK'ê dest pê kir. Bi bandora (tesîra) YNK'ê, çar meh berê di nav partîyê de nexweşiyek derket û Serokê Partiya Sosyalist a Kurdistanâ ya Iraqê Resûl Mamend tevî zilamên xwe yên girêdayî YEKGIRTINê, vejetiyan. Mamend derbasî YNK'ê bû li wir bi bertî Endamîtiya Buroya Siyasi girt. Hîne zilamên wî ji di nav YNK'ê de cih bilind standin.

Mamend pişti ku ji YEKGIRTINê vejetiyan, bi hevalên xwe yên kevin re şer ji kir. Li Koyansancaqê pêşmergeyên Mamend bi alîkariya pêşmergeyên YNK'ê ji avêtîn ser meqereyên (kampê) YEKGIRTINê û dest danî ser çend binahî û çekên wan. Di vî şerê birakujiyê de çend pêşmerge ji hatin kuştin.

Vejetina Resûl Mamend ku bi bertîla YNK'ê çêbûbû, di nav gelê Başûr de bi awayekî nukteyi tê gotin. Şair Muhammed Rencaw ji tevî Mamend ji YEKGIRTINê derbasî YNK'ê bû. Rencaw ku miroveki henekvan e, li çayxaneyeke, ji rojnamevanekî re bi vî awayî behsa Mamend dike: "Ez 15 sal komünist

bûm di Partiya Komünist a Iraqê de. Ez bi salan ji wan re xebitîm. Di dawiyê de min 400 dînar ji wan dizî. Tu gotin nema di eleniya min de gotin. Piş re ez cûm di gel Kak Resûl û dest bi xebatê kirin. Pişî mehekî min 4000 dînar jî dizi. Kak Resûl her cara ku min dibîne dibêje, "Rencaw zor (pir) şoresger e, zor welatparêz e! Ez çima neçim di gel wî?"

Serokê YEKGIRTINê yek jî ji Dr. Mahmûd Osman e ku, seroketî partiya PSK-I'yê ye û hevalê Mamend e. Osman ji dev ji siyasetê berda û niha li Samî û Ewrûpaye diji. YEKGIRTIN, ji bo PDK û YNK'ê wek masiyekî biçûk tê xuyan da ku bixwe û siûca YEKGIRTINê ji qet nîn bû. Lewre PDK ji li pey YEKGIRTINê bû. Pişî Resûl Mamend derbasî YNK'ê bû, PDK ji li pey Samî Abdurahman ket. Samî Jixwe berê di nav PDK'ê de bû û jê

vejetiyabû. Samî û Mesud Berzanî du meh berê li ser derbasbûnê, bazaar xwe kîrin. Ew li ser cend tiştan li hev û din kîrin. Li gorî van şertan dê Samî ji dêli Hemze Abdulah ve bibe sekreterê PDK'ê û hinék zilamên wî jî dê di PDK'ê de di pa-yeyen bilind de cih bigirin. Şertekî wan û din jî ku amblema PDK'ê, bi şeklê du (2) destê ku bi hev girtine, bê guhertin. Ew şerten jorîn hatîbû pejirandin.

Kongreya PDK'ê di 16'ê Tebaxê de li başûrê Kurdistanê dicive. Di vê kongreyê de, dê ew qerarîn Samî Abdurahman bêne diyarkirin. Şîmane ye (îhtimal e) ku YEKGIRTIN xwe fesh bike. Ji niha ve ji bo YEKGIRTINê di kongreya PDK'ê de cih hatiye vejetandin. Berpirsiyare YEKGIRTINê yê Enquerê Dr. Xeyrullah ji buroya xwe radagirt û çû ket nav buroya PDK'ê.

Navê mirinê Gîhadîn e...

Bihar hat

Dengê tanqan, balefîran, firindeyan

Wek sewta Decal...

**Zarokan leyistik hişt, dane pey tanqan,
bi kevir**

**Çivîk firiyan, gul perçiqîn, daristan
hilweşîyan**

Keçen çavres bi lez ji zozanan reviyan

Xortan tifing hildan derketin çiyan

Bêhna qetbirrê dihate xuyan...

Zahîr Kayan

AGIRI- Di dîroka xwe de Serhed, cihê gernas û egîdan e. Serhildana Agiriyê, ya "Geliye Zilan" giş berhemên vê gernasiyê ne. Di van heyaman de gelê Kurd li hember neyaran êrişen nemir bi kar anîne û navê xwe bi zêr li dîroka Kurdistanê nivisîne. Di bin bandora Partiya Karkerê Kurdistan de ev çend sal in li Kurdistanê xebatê pîr hêja pêk têr û ev bûyer li ser pişta şoreshan û karkeran diqede. Bi rastî li Kurdistanê şerekî pîr dijwar didome û bi dayîna hinek bedelan re pêl dide. Her derê Kurdistanê bi xwîna egîdan hatîye avdan, iro hemû gerdûn şahidê vê rasîtiyê ne: Kurdistan a Kurdan e. lê wisa jî cihê hemû însanên baş û qenc e.

Dema hewara êrişâ dewletê ya li ser Gîhadînê (Diyadîn) ji me re hat, em miçiqîn û me bawer nekir ku gerîla li gelê Gîhadînê dabe. KT (TC) bi virran mejiyên însanen tarî dike û rasitya bûyeran bi mirovan nade diyarkirin. Ji ber sedema êrişâ KT'a li ser Gîhadînê, ez û nûçevaneke (muxabîrekî) Özgür Gündemê em cûne Gîhadînê, lê tiştîn me bi çavên xwe dit zor bi dev û nivîsar werin diyarkirin. Ji Zîro (Murat) wê de, ta Gîhadînê hemû rê û dirb ketibûn bêdengîya mirinê. Gund bêdeng bûn, çiya û zozan bêdeng bûn... Li derve tu însanek nedihate xuyan, hikmê



Li gor bernameya qirkirinê yê generalan li Gîhadînê prôwayeke qirkirina girseyî pêk hat. Di malekê de 6 kes ji aliye timen taybelî ve hatin şewitandin.

rok kutan, dayîk avêtin erdê û bi pehînan rabûne ser, xorten navçeyê giş birin xistine binçavan û di wan girtîgehê xwe de îşkenceyên nebihîstî li ser wan didomînin."

Dema me nêzikî li Gîhadînê kir cihekî ecêb derkete pêsiya me, gel kepengen xwe girtibûn û di nav kolanen navçeyê de tek tûk mirov hebûn. Avahiya Emniyeta Gîhadînê weke marekî pêzik li ber çavê me xuya dikir, camen wê hûrşiyabûn û li ber devê bînayê tîman qicen xwe li ser hev re avêtibûn û bi awayekî qehirî li hatin û çûyînan mîze dikirin. Her zanibûn em gundi ne, rîwi ne, lê nizanibûn ku em rojnamevanen Özgür Gündemê ne. Qederek zeman derbas bû, mînibûseke biçuk li ber me sekinî û em lê siwar bûn û me berê xwe da navçeya mirinê. Xwediyê mînibûsê xortekî welatparêz bû, ji me re li ser rewşa Gîhadînê qise kir. Ewî digot: "Hün rojnamevan in, hem jî yê Özgür Gündemê. Ezê ji we re rewşa navçeyê bêjim: hün jî bi ivî in. Gerîla neketiye navçeyê KT (TC) virran dike, ev bûyeren ku qewimîne giş KT ê kiriye. Bi wan tîmen xwe yên nîjadperest hemû malen welatparêz. Dene ber bombe û hewanan. Dilê wan bi tu kesi neşewitî, qîzen xam bi zorê ji malen wan derxistin birin, za-

Qeymeqam Ahmet Göçerler (Rambo) anonsekî dike, di anonsa xwe de wiha dibêje: "Terrorist êriş daye ser navçeyê, ev li ba wan namîne..." Bi dû anonsê re KT bi hemû ekibêne xwe yên xwînmij ve êrişî ser di-kan û malen Gîhadînîyan dîkin û didine ber roket û bombe-yan... Lê di êrişen xwe de, dê li ku derê bidin û li ku derê nedin giş tesbit kirine. Hem navçeyê didan ber gullebaran, hem ji êriş dibirin ser malan û xort û qîz hildidan dibirin. Wek keftaren birçî zilm û zoriyekê nedîti li ser însanen bêguneh dîkin. Li zarokan dixistin, li keçan dixistin û gotinê nerind ji wan re digotin. Dema ku roketan diavêjin dikana Burhan Çiftçi, ew birîndar dibe. Diya Burhan Çiftçi ji me re wiha got: "Lawo em giş di qata jorê de bûr. (Di binê wan de dikan heye) Wê demê ji nişka ve dengê gulle û topan hat û min ji Burhan re got li dikana me dixin û wî bawer nekir. Paşê bêhna dû hat û dû re agir em hildan. Di hundir de Burhan, Mahîde, Ender, Dilşa, Rûken, Canan hebûn giş-kan xwe avêtibûn ser bavêne xwe û ji hundir derneketin. Min xwe di pencereye de avêt." Dû re gel digot: "Tîm li ber derê dikane sekinibûn û nedîhiştin ku tu kes here wan xelas bike, ê ku diçûn tîman lê dida. Li ber çavên herkesi ew şes kes di nav agir de şewitîn." Em li navenda navçeyê gerîyan û me ecêba gi-ran bi çavên xwe dit. Maleka ku gulle lê neketibû tune bû, di-kanen welatparêzan pîr xera bûbûn, dikana malbata Çiftçîyan hatibû dehibandin. Li kol-anen taxen Gîhadînê însan wek serxweşan li hev diçûn û dihatin. Her kes derdeki wî hebûn, yê ku digotin xwişka min birine, yê ku digot qîza min a donzdeh sali birine, yê ku digot mala min xera kirin, yê ku digot PKK'ê niha li we derê...

Diya Burhan Çiftçi, Dayîka Nazmiye jineke bi heft gurçık bû, li ber çavê wê şes cîger şewitibûn, lê wê hê ji baweriya xwe ji gerîla neqetandibû.

İro Kurdistan di vê rewşê de ye, jînê me û keçen me bûne dil û bendiyê van kedxwaran. Hemû Kurd bûne dil, neyar çawa bixwaze wisa dike, bi gerîla nikare hêrsa xwe di serê gel de derdixe. Nifusa navçeyê deh hezar e, lê hêzên KT bêhejmar in. Ev tirs e, ev bêçaretî ye lê ew pê nizanin. Min tişteki herî mezin jî kîfî kir. Gelê Kurd di bin bandora zilmkaran de be ji dîsa xwe bi hevsarekî digire û dilê xwe ji rojê xweş naqetîne. Baweriya xwe bi gerîla tîne û tîkoşîna xwe li hember zilmkaran didomîne. Di çavên wan de tevî tîsre hêvî û baweriyeke gi-ran xwe dida nîşan. Ew tîrsa di çavên wan de wek ne tîrs bû, lê kin û bixz bû li dijî van zaliman bilind û bala dibû. Lê ev zilm tu car ji wan re namîne wek gotina pêkenîvanekî:

Gede hate ba bavê xwe û got: "Bavo bizinê giyayê lodê xwar." Bavê got: "Kurê min mereq neke ji bizinê re namîne." "Gede sibehê hate ba bavê xwe û got: "Bavo bizin mir." "Bavê wî got: "Çawa bû?" "Kurê wî got: "Guran xwar." "Bavê bersiv da: "Kurê min ji guran re jî namîne."

Gede sibetirê (roja din) hate ba bavê xwe: "Bavo gur ji hatin kuştin." Bavê go: "Kurê min kî kuşt?" Gede got: "Nêçîrvan." "Bavê hilda got: "Kurê min ji nêçîrvan re ji namîne." "Gede sibehê hat got: "Bavo nêçîrvan jî mirin." Got: "Kurê min cawa bû?" Got: "Bavê di bin sepê de man." Got: "Kurê min ji sepê re jî namîne. Bihar hat û tavê li sepê da û sepê ji holê rabû... Rewşa zilmkaran jî dê wek rewşa bîzinê, gurî nêçîrvan û sepê be. Baweriya me ev e.

Kongreya KDP'ê ya 11. dicive

Kongreya Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê (PDK-I) ya 11. li bajarê Selahadîn di 16'ê Tebaxê de dicive.

Serokê PDK'ê Mesûd Berzanî li ser civîna Kongreya xwe bi awayekî nivîskî diyar kir. Di diy rîkirina xwe ya nivîskî de Berzanî, "Ev kongre ji bê partî û gelê Kurd siudeke" got. Mesûd Berzanî ji bê ku Serokê Partiya Demokrasiyê (DEP) Yaşar Kaya ji bêşadarî kongreyê bibe, dawetnameyekê jê re şand.


‘Em bi çanda xwe bi qedr û qîmet in’

Bi zanîna min hûn endamê HUNERKOM'ê ne. Hûn dikarin kar û xebatên HUNERKOM'ê bi me bidin nasîn?

— Belê, HUNERKOM sazûmaneke çandî ye. Di sala 1983'yan de hatiye damezirandin. Wek hûn dizanîn di sala 1980 (12'ê Îlonê) eskerî hate ser hikûm. Zilm û zoreke dijwar li ser Kurdan hate meşandin. Ji aliye aborî ve domandina jiyanê giran bû. Ji ber van pirsgirêkan malbatêñ Kurd, xort û ciwan derbasî derveyî welatê xwe bûn. Me ji armanc kir ku li wir, em ji xwedî li miletê xwe derkevin. Karê herî mezin ew bû ku, em bikarin nirxên neteweyî yên ku hatine perçiqandin, talânkirin di nava gelê xwe de jiyan bikin û xwedî lê derkevin û bi tevger bikin. Em di xizmeta welat de dikaribin wezifeya xwe pêk bînin. Bi vê armancê HUNERKOM hate avakirin. Bi çend hevalênu ku xwedî berhem û huner bûn hate avakirin. Li ser xwe ji me wezifeyek girîng dit ku, em bikaribin folklor, muzîk, şano û hin tiştên din ji weke xizmetekê bikin û ıstifadeyên mezin di şertên Ewrûpayê de bigirin, bidine gelê xwe. Gelek xort û keçen Kurd ên xwedan hunerwerin cem hey. Armanc ev bûn

Me heta iro bi rastî gèlek
tiştên girîng çêkirin. Ez dikarim
bibêjim ku di nava pirr netewe-
yan de sazendeyeke mîna HU-
NEKOM nehatiye avakirin. Li
derveyî welatê xwe, di nava de-
lametên neteweyê gelê Kurd de-
hate avakirin. Bi sedan şev, sa-
dimanî pêk hatin, bi şevêni piş-
giriyê, her pêşketinêni li welat
dibûn, me bi muzîk. şano û
folklor derbasî nava gel dikir.
Gelek hevalên hêja derxistin.
Hunermendê şoresger ji der-
ketin. Ji wan hunermendê ku
serkêsiya damezirandina HU-
NERKOM kirin, hevalên me
Sefkan û Mizgin ne tenê ji bo
huner û çandê, lê ji bo şores û
Kurdistanê ji roleke mezin listin.
Di şexsê wan herdu hevalan de
bi sedan keç û xort hatine cem
hevdî. Nêziki 30 komên me
yên folklor û 20 komên me yên
muzîkê hene. Belki amator bin
ji, lê bêhtir bala xort û ciwanên
Kurd kışandiye ser xebat, çand
û hunerê. Iro tevgereke 'bilind
çêkiriye. Nêziki 1000 endamên
xwe hene. Di nav neteweyên cî-
hanê de wekî mîhrican cih girti-
ye. Di gelek dewletên cîhanê de
mînak: Çekoslovakia, İspanya,
Qibrîs hwd. di mîhricanen me-
zin de me cih girt. Nêziki 45
qasetên muzîkê. 4 qasetên vídi-
yo di warê muzîkê, civak, folk-
lor, şanoyê de der cûne. Gelek
danûstandinê HUNERKOM'ê
bi hunermendê (biyanî) re ji he-
ne û heta iro ji xebatên me di-
domin.

Wek tē zanin HUNERKOM



SEYÎDXAN KÎ YE? Ez di sala 1960'an de li navçeya Mîdyadê (gundê Mîzîzik) ji da yîk bûme. Civaka ku ez tê de mezin bûm, civakeke şûn de mayî bû. Tesîra begî û a xatî pirr kûr dihate dîtin. Tesîra mêtîngîriya Tirk di wê mintiqê de gelekî dihate dîtin. Di civakeke wiha de gelekî zehmet bû wek netewe, xwe nas kirin. Di dibistanên Tir kan de jî zêdetir li ser Kurdan zilm û zorî dimeşandin. Bi van sedeman jî ez di sala 1970'yan de derketim Ewrûpave.

KOM dixwaze yekîtiya huner-mendên Kurd fireh bike. Çi xebatên we çêbûn di vî warî de?

DIVÊ HUNERMEND BI RÊXISTIN BE

— Rast e, em dixwazin hemû hunermendên Kurd bînin cem hevdu û berhemên wan ji bo gel û şoreşê bi kar bînin. HUNERKOM wekî ku hûn dizanin ji damezirandina xwe heta îro tu carî mafê şexsî, eşîrtî, oli, malbatî nexistiye pêşîya mafê neteweyî. Her tişt ji me re bingeha xala neteweyî ye. Madem ku em Kurd in, bi Kurdi dibejin, berhemên xwe yên hunerî, çandî pêşkêş dikin, divê bingeha me ji, berî her tiştî li ser bingeha neteweyî ya gelê Kurdistanê be. Elbet daxwaza me ya girîng ew e ku, ew kesên hez ji neteweşa xwe dike, bi rastî dixwaze berhemên xwe ji bo gelê xwe bi kar bîne, daxwaza me ya herî mezin ew e ku em van insanan bînin cem hevdu. Ji bo wan hunermendan pirr caran me bang kirin (yên derveyî welat.), me di belavokên xwe de gotin, me rewşa xwe û ya wan jî aniye ziman. Ev kesên ku bi rastî bixwazin berhemên xwe ji bo şoreşâ gel bi kar bîne, bi rihekî welaçparêzî bi kar bîne, deriyê HUNERKOM'ê ji wî re vekirîye. Lê heta niha bersiva banga me bi xurtî nehatîye dayîn. Ji ber ku hin sebeb hebûn. HUNERKOM dihate naskirin ku tenê ji bo mafênek yek hêzekî tê bikaranîn. Bi rastî hinek nêrînê rast li ser HUNERKOM'ê hebûn. Lê gelek huner-

mend xwe ji rewşa siyasi ya
gelê Kurdistanê cuda kirin. Ji
ber wê ji xwe bi jiyanekê sexte
girê didan. Dixwestin berhemên
xwe serbixwe pêk bînin. Lê ew
çare nîn e. Em dizanin iro qede-
ra gelê Kurdistanê bêyi tevgera
siyasi nayê azadkirin û em jî, ji
wê rewşê ne cuda ne. Eger em
behsa yekîtiyê, mezinbûnê bi-
kin, HUNERKOM ji aliyê xe-
batêن xwe ve, ji aliyê zelalkirina
siyasi ve gihiştiye wê rewşê. Wê
daxwazêن me jî, ji wan hebin û
daxwazêن wan jî, ji me hebin.
Dem ne dema ku hunermendek
bi serê xwe jiyan bibe û bimîne
li derveyî gel û şoreşa xwe.
Dem ne dema ku hunermendek
bibêje: "EZ bi serê xwe hunera
gelê Kurdistan azad bikim." A-
madekariyên nû hene, HU-
NERKOM dixwaze karekî aka-
demik pêk bîne. Ji bo wê di de-

ma pêşîya me de bi konferanse
ke mezin, dê di nava xwe de çâ
reser bikin. Rengekî nû û dê bi
dine xebata hunera gelê xwe i
yekîtiya hunermendên Kurdis
tanê. Bawer dikim di demek
nêzîk de emê bangî hemû hu
nermendên Kurd bikin. Kî dib
hila hibe û nav ne gerek e

We kengê dest bi muzikê
kir û hûn kîjan muzikê çedi
kip?

- Li herêma ku ez tê de mezin bûm, di zarokatiya min de guhdarîkirina radyo û dengbêjan hewesek li min peyde kîn. Lê bi rastî li welat îmkan tun bûn ku xebata muzîkê û daxwazên xwe pêk bînim. Pişti ku ez derbasî Ewrûpayê bûm, edikarim bibêjim di sala 1981'ande bi kurtayî min dest bi xebatê muzîkê kir. Muzîka gelêr bêhtir min nêzîkî xwe dit. Dema

ku muzika Kurdî ez didim berçavêن xwe. di dîroka me de û jiyanâ civaka gelê Kurdistanê de bêhtir stranêن gelêri roleke mezin lîstine. Berî l er tiştî berhemên me yên neteweyî, folklorâ Kurdi ya kevnare û stranên gelêri ne. Ji bo wan ez tî bûm. Ji bo naskirin û gotinên wan heta iro jî bêhtir li ser muzika gelî diseokinim. Em muzika xwe bi rewşa welat girê didin û li gorî wê teze dikin. Heta niha 2 qasetêن min hatin belavkirin. Pirraniya helbestan li ser şehîdan û welat in. Ez endamê Komâ Berxwedan im jî.

GEL KANIYA ME YE

*Gelo tu daxwaz û mesajén
we hene?*

- Berî her tişti em di demeki
dijwar de dimeşin û jiyan dibin.
Em çiqas li huner û çanda gelê
xwe xwedî derkevin, bizanin,
nas bikin, xort, ciwan û zarokên
xwe bi ziman, folklor û muzîka
xwe mezin bikin û bi wan bidin
fêmkirin û guhdarîkirin, di çand
û hunerê de emê ewqas bi pêş
ve biçin. Her milet bi hebûna
huner û çanda xwe, xwe dinase
û heye. Em bi huner û çanda
xwe biqedir û qîmet in. Divê
xort û ciwanên Kurd bêhtir li
huner, çand û folklora xwe
xwedî derkevin, bilizin, bibêjin.
HUNERKOM ji bo we amade
ye. HUNERKOM kaniya gel e û
gel jî kaniya me ye. Ji huner-
mendêne derve jî em dixwazin bi
sexsiyeta kesanî û serbixwe dûr
bin, xwe bi yekîtiya gelê xwe ve
girê bidin. Ji bo rojnameya We-
lat jî berî her tişti jî bo fersenda
vê hevpeyvînê em kêfxweş bûn.
Di bin şertên gelek zehmet, bi
kedekeşî mezin û herî hêja de tê
nivîsandin û çapkiran. Em bi çâ-
vekî bilind lê dinêrin û di xizme-
ta gelê xwe de ye. Rojnameya
ku di demeke dirêj de bi zimanê
me tê nivîsandin û gelek bûye-
ran di nava xwe de dicivíne ro-
lekeşî mezin dilize. Bi rastî rojna-
meya Welat kaniya welat e. Li
Ewrûpayê bêhtir me ber bi we-
lat dibe û em dibêjin, pîrozbâ-
hiyeke mezin e, li gelê Kurdistanê.
Di van şertên zehmet de
serkeftin jî hemû berpirsiyar û
yebatkarân wî re diyuvarim

**Hevpeyvîn:
Bêrivana Dêrsimî**

‘Rojek Ji Rojê Evdalê Zeynikê’ bi zimanê Erebi der çû



*Berga pirtûka 'Rojek ji Rojêr
Evdalê Zeynikê' ya bi Erebî*

Îro tevgera toreya Kurdî li başûrê rojavayê Kurdistanê (Surî) rojên pirr xweş û geş dibîne. Gavêن mezin di-avêje. Nemaze di warê wergerê de. 'Roja toreya Kurdî li esman qet naçe ava. Yek ji wan berhemên toreyî, wergera romana Mehmet Uzun "Rojek ji Rojên Evdalê Zeynîkê" ya li ser zimanê Erebî ye. Roman ji layê (aliyê) Mihemed Nur Huseynî ve, bi zimanekî Erebî ya şîrîn û bedew, tijî wêneyêن hunerî (teswîrêن hunerî) bi narînekî ji nav zi'manê helbestî xweş dikeve guhêñ xwendevanan.

Xuya ye wergêr xwe pirr westandiye ta ku, tu guherin nexe mijara romanê. Dimîne em bibejin ku, wêneyê berga pirtûkê ji aliyê hunermendê Kurd nîgar (wênesaz) Reşîd Hiso ve hatiye nexşandin, û ji hêla Pirtûkxaneya Xanî ve li bajarê Helebê der çuye û hatiye belavkirin.

Di dîroka Kurdistanê de Ebû Muslimê Xoresanî

Selîm Biçûk

Ebû Muslimê Xoresanî, Ebdurrehman kurê Muslimê Rawendî ye Li Kurdistanâ Azerbaycanê, li gundê Mawît, di sala 718'an de hatiye rûyê dinê. Li cem Isa û İdrîs kurên Meqel ku di wê demê de fermandarên Ristaq Fayiq bûn, bi xwedî û mezin bûye. Her wiha ji xwendina xwe li wir dawî kir û bû mirovekî jîr, gernas û hozan.

ÊLA ABÛ MUSLIM RAWENDÎ

Major Rawlensen dibêje: "Pirren xelkê Rewandiz ji êla Rawendî ne. Hejmara şeniyê vê êlê 12 hezar mirov in. Li hêla Sîdikan ku dikeve ciyê, 40 gundên wê hene. Di van gundan de 1000 malbat heye. Bavikên pîresorî, Balekî, Risorû û Şerwanî ji, ji vê êlê ne. Eşîra Rawendî 12 parce ne: Mamgurd, Mamsa, Mamsîl, Mamxal, Mamlis, Mameyî, Mamkal, Mamiskî, Mamsan, Pîrbal, û Gelo. Hin eşîrên din jî, têkelî wan bûne wek: Şexab, Malyas, Nûrik, Hinaray, Xelanî, Kesan, Şex Mehmedî, Bamamî, Dirêjikî, Sêkeyî, Herîrî, Şikelî, Mendikî, Pîr hacî û Bamar.

ŞOREŞ Û FERMANDARIYA EBÛ MUSLIMÊ XORESANÎ

Isa û İdrîs fermandarên Ristaq-fayiq bûn ku dikeve Kurdistanâ Qefqasê (Azerbaycan). Deynê dewletê nedidan. Heta ku li ser wan giran bûn. Xalid kurê Ebdullah Qisrî ku ji hêla Emewiyan ve wali û fermandarê İraqê bû û li Kûfayê rûdiyişt, doza salyan a dewletê li wan kir. Bi vê dozê herdu girtin û xistin zindana Kûfayê. Berî girtina wan Ebû Muslim şandibûn Ristaq- Fayiq ji bo salyana gundiyan bicivîne. Lê çawa bihîst ku Isa û İdrîs hatin girtin, ew pere birin û cû li cem eşîra Benî İcîl rûnişt. Asim, kurê Yûnisê Ichiyî, berî wan hatibû girtin û ew bi xwe ji. ji hevalbendên Mihemed kurê Ali kurê Abdullah kurê Abbas bû. Diwxestin peyrewê (xelîfe) ıslamê deynin. Rojeke cend hevalbendên Mihemed ji Xoresanê hatin Zîndana Kûfayê serdana Isa İdrîs û Asim wê çaxê ji. Ebû Muslim li zindanê bû. Çawa van mîvanan jîr û hozaniya wî dîtin, xwestin ku bikin hevalbendekî xwe. Ew daxwaza wan pêk hat û bi



xwe re birin nik Mihemed ku ew ji, gelekî pê dilxwes bû û li nik xwe hişt. Dema ku Kurdên Xoresanê yên hevalbendên Mihemed serkarê jîr, zana û gernas jê xwestin, Ebû Muslim ku xwediyyê van taybetiyan bû ji bo wan binartin.

Di sala 746'an de Ebû Muslim li bajarê Merwayê serî hilda û doza padîşahiyê li Emewiyan kir. Bi leşkerê xwe yên Kurd ve bi mîrxasî ala ser hilda û êrisî leşkerê Emewî kir. Di wê demê de, ji hêla Merwanê kurê Mihemed Kurê Merwan ê Emewî ve Nesîr Kurê Seyarê Leysî fermandarê Xoresan bû. Li hember Ebû Muslim nikaribû xwe bigire. Di-şer de-sîkest û baz da cû Sawayê, hêla Hemedanê û di sala 748'an de li wir mir.

Di sala 750'î de Ebû Muslim kurê Kerman li bajarê Nûşebûr girt û avêt zîndanê û paşê kuşt. Her wiha Ebû Muslimê Xoresanî bû Padîşahê Xoresan wê çaxê Mihemedê Abasî miribû Abdullahê kurê wî ji, xwe veşartibû. Lê Ebû Muslim axaftin (xutbe) li ser navê wî da xwendin û leşkerê kî giran rakir ser Merwan. Jî nû ve Abdullah leşkerê xwe di bin serdariya Abdullah kurê Eli, apê Abdullah kurê Mihemed de hinart ser Emewiyan. Li ser cemê Zap'ê li Keşafê her du leşker rastî hev hatin. Pişî serekî giran leşkerê Emewiyan şikest. Merwan ji, ber bi Samê ve revi. Lê leşkerê xorasanê da pey sopa wî û nehist ku li Samê cih bigire. Li

Misirê, gundê Bûseyr Feyûm hat kuştin. Bi vî awayî Ebû Muslimê Xoresanî bi hêza leşkerê Xoresanê yê Kurd Peyrevî (xilafet) stand û sipart Abasiyan. Lê bi rastî padîşahî di destê vî gernasê Kurde de bû. Di çaxê Sefah de hertiş bû. Tenê bi nava peyrewî ya Abdullah bû. Welat ji dijminê Abasiyan paqî kiribû. Lê nizanîbû ku rojek dê were ku ew bi tenê ji bo wan dê dijmin bimîne. Mixabin, baweriya wî ya alî ew xapandibû. Ev ji, bû sedemê ku xwe bi temamî bisipêre Abasiyan heta ku sala 755'an li ser destê wan hat kuştin. Vê nimûneyê, bi dehan car xwe di dîroka Kurdistanê de vegerandiye. Lê mixabin ders jê nedihatîn girtin.

KUŞTINA EBÛ MUSLIM

Di sala 755'an de Abdullâh li Kûfayê mir. Birayê wî Ebû Cafer Mensûr li şûna wî peyrewî girt û çavê xwe berda kuştina Ebû Muslim, ji ber ku bûbû tirsek mezin di dilê wî de. Rojekê Mensûr hat eywanê Kesrayê û şand pey Ebû Muslim ji bo dîtinê. Serd mirovîn bi çekan rapêçayı ji, di çend odayan de veşartibûn, ku kengî destê xwe li hev bixe wî bidin ber xenceran. Ebû Muslim ket eywanê. Di cih de Mensûr surê wî jê xwest, ji bo ku lê binêre. Sûr da dest Mensûr. Mensûr dest bi axaftinê kir û got: "Te, apê min Abdullah bi vî sûri kuştîye?" "Ebû Muslim got: "Belê min dij-

minê te pê kuştîye." "Mensûr got:" Ditirsim tu min ji, bi vî Şûri bikujî û dest bi gazinan kir. Ebû Muslim têghîştibû ku dê wî bikujê, lê dixwest bi awayekî diplomasî xwe jê rîzgar bike. Her digot. Ya Emîr Almûminîn min ji dijminê xwe re bihêle. "Lê Mensûr got:" Ma te ji xwe û pê ve dijmin ji min re hiştinê Xweda min bi kuje, eger te nekujim û destê xwe li hev xistin peyayê wê derketin û dan ber xenceran Mensûr. ji, diqîrya û digot: "Bikujin, bikujin..."

Bi vî awayî Ebû Muslim ê gernas kuştin û serê wî jêkirin û avêtin ber leşkerên wî yên ji eşîra Rawendî ya Kurd. Gotin bila kes tev nelebite peyrewê ıslamê ew kuştîye.

TAYBETIYÊN EBÛ MUSLIM

Ebû Muslimê Xoresanî mirovî mîrxas, zana û hozan bû. Tu caran tîrsê di dilê wî de cih nedigirt. Paxav ji kesî nedîkir. Di civatan de, her dem evrist digot.

Bi xurtî û dizî gîhamê Cihe ku padîşahê Merwanî-Emewî Nikaribûn bi leşkeren xwe bigîhînê Min dixwest wanbihîrifinim Lê, ew di xew de bê hayrazbûn Ta ku min bi sûr li serê wan da Bi xwe hisyar bûn ji xewa ku hêj Berî wan kes tê de

nerazEbûn

Ew kesê pezê xwe li hindemeke bi şer Biçerînê û raze dê şer dibin şivanê wî pezî.

Mamûn dibêje: "Padîşahen mezin û navdar di cînanê de sê mirov in: 1. İskender. 2 Erdeşîr 3. Ebû Muslim."

Medayînî dibêje: "Miroveki şerîn bû. Bejin bilind bû. Gelek ristîn ciwan û hêja ji ber kırıbûn. Nedikenî û henek bi kesî re nedikirin. Dengê xwe bilind nedikir. Bi farisî û Erebî başzanibû. Hozan û hisyar bû. Gelekî bîrawer bû."

DI DÎROKA KURDISTANÊ DE MUSLIM

Bi xurtî û mîraniya xwe dilxwes nedibû. Ji tengasiyan nedixeyidî. Salê carekê diçû nivîna jina xwe, digot "Cûna cem jînê dînîtiye. Ma, ne bes e ji salê carekê mirov xwe dîn bike."

Kurê Şebrema, dibêje: "Rojekê min jê pîrsî. Xwedê Padîşah biparêze, ku di cîhanê de mîrtir û gernastir e. "Di bersîva min de got: "Di serî de ji bo serwxebeûna miletan, her mîlet mîr û gernas e."

Ebû Muslim ne dilbijekê malê dînyayê bû. Destvekirî û merd bû. Dibêjin carekê cû hecê, gazî kir û got. "Bextê min ne ji wî mirovî re be ku a-girê xwarinê bike û bi carekê xwarin û vexwarina hecakan wê sala da." Lê, mixabin pişî kuştina wî ristevanê (şair) Abasiyan Ebû Delama, navê wî kir. Ebû Mucrîm, yanî (bavê gunehkar) û wiha li ser dibêje:

Ya Ebû Mucrîm xwedê qençiyê xwe

Naguhere ta ku kole xwe neguhere

Te dixwest bêbexityî li Mensûr bikî

Rast e bav û kalêñ te yên Kurd bêbext in

Te ez bi kuştîne ditirsandim lê serê

Mezin tu di nav lepêñ xwe de perçîqandi

Lê rastî bi gotina Ebû Delamayê Patoxwer û hestî revêñ tucaran winda nabe. Ji ber ku dîrok dagerekî bidad û bibext e. Bi gotinê pûc û derewin dilsozî, mîrani, merdî û germa-siya Ebû Musîmê Kurd ji ber cavan nayê vesartin. Her wiha bav û kalêñ wî yên Kurdi ji, bêbextî nekirine û nakin û di her kocberên dîroki de nimûneyeke mirovahiyê e.

Hozan Gunnar Ekelöf

Farûk Yakûp

(DIMIL)

SWED- Hozanê gird Gunnar Ekelöf ser 1907 di sük a Stockhom di ameyo dinya. No hozanvano (şâîr) gird zaf ray şîyo Kurdistan û qandê (heqdê) Kurda di şîr (hodirawa) nûşnawo.


Ki o wexta na Gunnar Ekelöf şîyo Kurdistan, jew çiyê xirab Kurda di vînayo û a xirabey zî hondirawa yê xwi di nûşnawo. Ziwanê jîni weş esto, qandê çiçî jewbiyayena ziwanî çînya? Xwi ra pers kerdo. Servatenê êy 40 serî ravêryayo û ma nûştoxi wextê newey, nêy weş vînenê.

Qiyannêkerdena ziwanê ma yê edebî, zeydê wendoxan û zeydê nûştox xwi nişan dano.

Li no awa bi bêveng şewqê mi Zane biyayaya mi qandê xu Rûcîke mi di qermîçî zaf bî Bi zey qirika el'elo Çimê mino siyah di Meragê gird Bêderman biyo méraxsey Û respekt bê efo Ü veng, biyo bê hermonî Pize ameyo kardî kerdeni Û dima heme çî, amo zeliqnaveni Celat, merdim rûcikê cira si-nasneni Û lingî, ina şiknay Ziwan biyo qandê mahsi û şerab Û zey yê wezeno bimro.

Nika qismey rakewto Qismey zî bêmaneyo Hezkerdeni qandê mi Hezkerdeni pêwîsto Û zey, destê ci wezeno Bimro destanê mi di Wûnî ez xwi, vîneno ser awi di O pîsey peydê mi di mend Jew qîralê Kurda Qandê êy kütik vanê, Vano Romî, zeydê Selçûqî Careyê mi ser awi di O ziwan weş bida biyo işkence kerden û ameyo şîkyayeni Kamcîn ziwan di ez xwi daya bawerkerdeni Labirê nêki bêvengeya mi bî Û o leke işlikê mino ser di Merdim nêşeno bi aw biswo Nêşino zey gûnî ya, zey jerî ya Û pîneyê dijiminî. Zey nêweşeya weba Û nêweşeya weba siyâhtir.

Ez ney zaf weş zana ki, ez neşte mino ewili di şîma eciz bikera. Lo no zî esto ki, ziwanê Zazakî-Dimilkî wextê xwi yo qeçeyek di ro. Heta werzero ser saqandê xwi, no nûşê ma zî ser gopalî di ray şîro. Beno ki na çarneyeni hondirawa yê (şî-



Gunnar Ekelöf

îr) Gunnar Ekelöf zî weş nêbo. Labirê ez zî zey qeçika gopala ser şîna.


Wûniya Gunnar ziwanê to weşîbê "o ziwano weş, ki ameyo işkence kerdeni û ameyo şîkyayeni" Kurdistanî di tenya însanî nînê işkence kerdeni. Ziwan zî işkence beno û o ziwano dewlemend, kehen ameyo ameyo şîkyayen û ameyo işkence kerdeni, ameyo şîkyayeni. Însanî ma yê Ewrûpa di (Swêd xarîç), miyan di kurdê ma di çend nûştoxi vîcyayo. Ma ver a dê nûştoxi, zafê Kurdê ma nêşenê bûwanê, nêşenê binûşnê.

Heme parçê yê Kurdistanî di, ziwanê Kurd, serhewnayışê xwi jîyêno û no serhewnayışê ziwan, biyo serhewnayışî mîletê ma zî. Ziwan, wazanê bişiknê, wazanê vinî bikerê. La bilê, ziwanê ma no çend seriyo, no ziwan niyameyo kîştayenê. La çi wext ma biwazê jew name qandê famîle, enbaz û merdimê xwi binûsnê me pê fahm nîkenê, eno zî diyar keno ki, dijiminê ma sero çendi barbarey kero.

Qandê çiçî mi mika nîna nûşna? Heme qandê noyo ki, ez wazena bi nêya şimarê nîşanê Gunnar Ekelöf bida. Bewnê se vano hezanvano girdê Swêdi. Ki no hozanvan di komîta di Nobel û komîta di Akademiya Swêdi ca giroto û serokey kero. Nika ma bewnê se vano Gunnar Ekelöf:

O ziwan weş ki ameyo işkence kerdeni
Û ameyo şîkyayeni
Kamcî ziwan di, ez xwi daya vacê.

AZADÎ



Abdurrahman Durre

Faşîzm wek seyê har e!

Faşîzm, yanî zilm, zor, kuştin, talan, xwînxwarî û mêjokdarî, weke se û gurên har e. Ger mirov jê re serî deyne, ji ber bireve, têkoşîn û cenga wê neke, bêhtir dir û har dibe, bêhtir dijwar û xedar dibe. Divê dema ku se û gurên dir û har dor li mirov girtin, mirov bi hemû cureyan li hember wan rabe û bi her awayî têkoşîn bide û şer bike. Heta ku keys û fesalê lê bîne û derbêñ tûj û dijwar li pozêñ wan bide ku çewkîn ji wan were. Dema çewkîn ji yekî ji wan hat, hemû direvin.

Gotineke pêşîyan heye, dibêjin: "Mirov bi qûnixşan ji dijmin xelas nabe". Bi rastî ji wiyo ye. Dema mirov diçe gundekî an deveke biyanî, kûçikên wan têne mirov û dorê li mirov digirin. Mirov çiqas ji ber wan direve, ew ewqas dir dîbin. Dema mirov pişa xwe dide diwarekî û di poz de li wan dide, dibe çewkîna wan, dêlê wan dikevin nava lingêñ wan û direvin. Faşîzm ji wiyo ye. Heta ku mirov di poz de lê nexe, xwe jê xelas nake.

Çawa ku mirovên dor li wan tê girtin, pişa xwe didin diwar an darekê û xwe diparêzin, divê li hember faşîzmê ji mirov pişa xwe bide baweriyeke rast, doza xwe, gelê xwe û hemû aştîxwaz, demokrat, karker û şoreşgerên cîhanê û ji xwe re bike weke sîper, diwar, çiyayek asê û mezin û êrîş bide ser cenewarê dir, har û xwînxwar, heta ku keysê lê bîne û derba mirinê lê xe, çewkîn û fîzarê pê xe. Çare her ev e, ji bili şoreşgerî û serhildanê, faşîzm ji tu tiştî natirse û fêm nake.

Hemû şoreş û serhildanê gelên cîhanê wilo bûne, wilô meşiyane û wilô dimeşin. Serhildana gelê Kurd ji bi vî awayî ye û wilô dimeşe. Lê ev rastî ji heye ku, tu faşîzm weke faşîzma ku li serê gelê Kurd bûye bela, li tu derê cîhanê nehatiye dîtin. Faşîzmeke wilô barbar, hov û dijwar e ku, tarîf û teswîra wê nayê kirin. Ji ber vê yekê ji şoreş û serhildana gelê Kurd, ji hemû şoreş û serhildanê gelên cîhanê zehmettir, dijwartir û mezintir e. Dê di dîroka şoreş û serhildanê cîhanê de ji wilô cihê xwe yê taybetî bigire.

Bi baweriya min, serfiraziya şoreş û serhildana gelê Kurd, ne ji gelê Kurd bi tenê re, dê ji hemû gelên Rojhilata Navîn re bibe nîşana serfirazî, demokrasî, azadî, aştî û mirovatiyê û dê bibe xweşîya hemû cîhanê. Lewre dara mezin, fêkiyên wê ji mezin in. Kirêñ mezin ji karêñ mezin tînin.

Hêvîdar im ku, di demeke nêzik de em dê wê pîrozî û serfirazîye bibînîn û bextewar bibin. Bi hemû gelên cîhanê re, di nava aştî, biratî û serfirazîye de bi dilxweşî bijîn. Ji nîmet û xweşîyên demokrasiyê istifade bikin.

Wezîfeyên me gelek in

Geli miletê Kurd, wa ye hedise li ber çavvan e. Rismê hedisê wek neynik xuya dike. Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan dibêje: "Şerefa bêsexsiyeti tune." Kurdino! İro dijminê me yê hov û har, bi tanq, top, balefir û bi leşkerê xwe yê qirêj, li Kurdistanê kevir li ser kevir nahêle. Bênderên me ba dike, me hebo hebo belav dike. Li hemberi gerîlayê ARGK'ê dijminê me yê hov û har û zikreş, li ber xwe nadin, nikarin şer bikin. Lê, îcar dijminê hov û har ci dike?

Mihem Himbelij

Kurdino, welatparêzino, şoreshgerino, demokratino, kesê serbixweno, şêxino, meleno, bajarîno, gundîno, keçino, lawikino, insanê ku hema piçekî xwîn û şexsiyet pê re hebe, hemû kes! Guhê we dibihîzin û hûn dibihîzin, çavê we dibînin û hûn dibînin, ji we yên ku nabînin û nabîhsin, pembû ji guhê xwe derxînin û perdeyêni li ber çavê xwe rakin û li der û dora xwe binêrin, bibînin û bibihîzin. Welatê me Kurdistan wa ye li ber çavvan e. Dijminê hov û har, iro du rê dane ber me:

1- Eger hûn wek Hîkmet Çetîn, Kamran Înan, Mehmet Kahraman esl û feslê xwe ìnkar bikin û welatê xwe bifiroşin û xwe bêsexsiyet bikin, wê demê hûn wek miletê Tirkibin ìnsanê rêza yekemîn.

2- Na, eger hûn wek wan nekin, hûn hemû terorist in. Em we hemûyan dikujin.

Geli miletê Kurd, wa ye

hedise li ber çavvan e. Rismê hedisê wek neynik xuya dike. Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan dibêje: "Şerefa bêsexsiyeti tune." Kurdino! İro dijminê me yê hov û har, bi tanq, top, balefir û bi leşkerê xwe yê qirêj, li Kurdistanê kevir li ser kevir nahêle. Bênderên me ba dike, me hebo hebo belav dike. Li hemberi gerîlayê ARGK'ê dijminê me yê hov û har û zikreş, li ber xwe nadin, nikarin şer bikin. Lê, îcar dijminê hov û har ci dike? Diçe Gund, war, kon, çiya, deşt û daristanê welatê me bombe dike. Ne dibêjin mîr, jîn, kal, pîr, zarok, hemû insanê me yê bêcek û bêparêz didin ber tanq, top, balefirê xwe û wan tar û mar dikin. Bi wê jî namînin dicin gundan, malbatên welatparêz ên ku alîkarî bi gerîlayan re dikin, mal û warê wan bombe dikin, jîn û zarokên wan bi tevayî dikujin. Bi riya rojname, radyo û televidyonê xwe yên qirêj propaganda dikin, dibêjin: "Gerî-

layê ARGK'ê diavêjin ser gundan, zarokan dikujin."

Kurdino, welatparêzino, şoreshgerino, demokratino, insanê serbixwe, keçino, lawikino, bajarîno, gundîno, xwendevano, karkerino û hemû şexis û insanê ku dikarin bifikirin. Li der û dora xwe mîzezin, binêrin. Li dînyayê xeyni Kurdan kes bêmafê neteweyî nemaye. Li dînyayê miletê ku nîfusa wan deh hezar in jî, mafê neteweyî ya xwe girtine destê xwe. Bûnin dewlet. We caran bîhistiye û we dîtiye ku mîletekî nîfusa wî sih mîlyon be û bêmafê neteweyî û bêdewlet bel! Lê mixabin di dînyaya malkambax de mîletek heye, navê wî Kurd û û welatê wî Kurdistan e.

"Kurdistanek Tîrkan heye, Kurdistanek Erebân heye, Kurdistanek Farisan heye!" Lê "Kurdistanek Kurdan nîn e" Kesî ev ecêb dîtiye? Her kesen Kurdîn ku dikare hema piçek jî bifikire! Destê xwe deynin ser wijdana xwe û destê xwe biavêjin sînga xwe bihejînin. Xwe muhakeme bikin û ji xwe pirs bikin. Bipirsin. Em kî ne? Em ci ne? Em dikarin ci bikin? Karê ku ji destê me tê cîma em nakin? Gerîlayê me yê ku ji bo Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistanê şer dikin, em çawa dikarin alîkariya wan bikin û bibin alîkar? Lê em ci ma nakin?

Xwendevano! Ne dema ra-

westinê ye. Dema seferberiyê ye. Tu dikarî di xwendegheha xwe de gelek tiştan bikî. Eger tu nikarî biçî serê çiya şer bikî, tu dikarî bi qelema xwe şer bikî. Tu dikarî bala xwendevanan bîkişînî ser hovîti û barbariya ku dewleta xwînxwar li ser gelê Kurd dimeşine.

Tu dikanî xwendevanan organîze bikî û derkevî ser kolan û kuçan, dijminê hov protesto bikî û piştgiriya xwe ji bo gerîlayê ku li serê çiyan şer dîkin, diyar bikî. Xwe ji bîr neke ku tu Kurd i.

Karkerino! Ne dema sekînandinê ye. Derkeve ser kolan û kuçan dijminê hov û har protesto bike. Bi vê protesto yê tu balkêşıya karkeren febrikê dîkişînî li ser zîlm û zorddestiya ku dijminê hov û har ser gelê Kurdistanê dimeşînin.

Mamosteno! Ne dema sekînandinê ye! Bi xwendevanen xwe re derkeve nava bajêr. Dijminê hov rûreş bike. Piştgiriya xwe ji bo gerîla diyar bike. Vegere rastiya welatê xwe. Bi rûmet û serbilindî ji bo têkoşîna rizgariya Kurdistanê zarokên gelê Kurd, ji bo pêşerojê perwerde bike. Xwe ji bîr neke ku tu Kurd i.

Doxtorino! Ne dema rawestandinê ye. Di rojekê wiha de barekî gelek giran li ser milê doxtorê Kurdistanê ye. Tu bi zanebûna xwe, birînê gerîlayê Kurdistanê derman bike û carekî din ji bo têko-


şînê wan amade bike. Xwe ji bîr neke ku tu Kurd i! Ji bîr neke ku bi rûmet û serbilindî, di axake serbixwe û rizgarkirî de tu dikarî biji.

Kurdîn li Ewrûpayê! Ci rîexistinî ci bêrêexistinî, ez baş dizanim dema ku hûn hatin Ewrûpayê, we gotiye em "Kurd" in. We ji xêra axa Kurdistanê û bi xêra şehîdên Kurdistanê yên nemir, rûniştin standiye. Ji bîr nekin ku ev rehetiya ku hûn tê de dijîn, gerek hûn heq bikin. Gerek hûn xwedî li şehîdê û Kurd û Kurdistanê derkevin. Hûn dikarin bi gelek imkanen xwe besdariya şerê Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistanê bibin. Her ferdek divê ji xwe pirs bike? Min nikanibû li Kurdistanê li diji dijmin şer bikira, lê ez karim bi gelek awayan, li gor imkanî xwe piştgiriya gelê xwe bikim. Xwe ji bîr neke ku ew pereyê ku tu didî vexwarinê, ger tu bişînî welatê xwe, tu pê du-sê malbatê Kurdîn yên ku, yan law û keçê wan, yan mîrê wan di şerê neteweya Kurdistanê de şehîd ketine, tu dikarî bi wan pereyan pê wan xwedî bikî. Xwe ji bîr neke ku tu Kurd i. Tu vê rehetiyê, ji xêra Kurdistanê û şehîdê Kurdistanê dibîn.

Kurdino! Karê ku em bikin zehf e. Em barê rizgariya Kurdistanê hemû nedîn ser milê gerîlayan. Karê ku em jî bikin hene. Li hemberi dijminê me yê hov, çekê me yê herî mezin, qeweta gel e. Karê me yê herî girîng ev e: "Hevgirtin û xwedî li Kurdistanê derketin e."

XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zilanî



kevin ê gelêri 11-Eybdarkirin 12-Ji bo koma pezan tê gotin, colex

BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÜYİ

Çeperast: 1-Ra mi Bedirxan 2-Afirîner/ Arî 3-Peşarı/ Qamik 4-Erk/ Eyd/ Den 5-Rî/ Awarte/ Gr 6-Int/ Es 7-Ker/ Renc 8-İkaz/ Ria 9-Fer/ Fr 10-Monarşî.

Serejêr: 1-Raperikin 2-Aferînek 3-Mışk/ Trafo 4-İRA/ Zen 5-Birewîr/ Ra 6-Eniya şer 7-De/ Dr/ Nîfş 8-Iraq/ Tucari 9-Ade 10-Xame 11-Aring 12-Nîk.

QERTA ABONETİYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiyê razînin:

Li derive: Y. Serhat Bucak

İş Bankası Cağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Li Tîrkiyê: 385393

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopiyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin.

Navnîşana Welat: Kadırga Liman cad. No.92

Eminönü 34490 İstanbul Tel: 518 25 28

Fax: 518 85 54

Mercen abonetiyê:

| | |
|--------|-----------|
| 6 meh | Li hundir |
| 12 meh | 120.000 |
| | 60 DM |
| | 240.000 |
| | 120 DM |

Mirina birûmet

Şükrü Gülmüş

Mirin heye û mirinok heye!..

Mirin heye mîna jiyanê ye. Mirin heye mîna mişkekî mîrdar e!..

Mirin heye, birayê jiyanê nû ye. Mirin heye mîna tîfek êşa zirav e!..

Li ser jiyanê çiqas axaftin û nîvîsandin hebin, ji wan sê qat piirtir, li ser mirinê hene. Lewre mirin û jiyan weki cêwîyan e. Gava mirov tê dinê, em kîfxwes dibin. Lî belê gava ku mirin tê holê, em şînê girê di-din. Jan û xem tê ber zimanê me. Ger em ji nava mirinan, mirinê bineqînin. Mirina li hember cîhanê:

Mirina rûmetdar, mirina mezin, mirina rojiya mirinê ye!..

LI SER MIRINÊ ÇI GOTIN?

Epikorus: "Em ji mirinê natîrsin!.. Heta ku em hebin mirin tune ye. Gava ku mirin hat em tune ne!"

Mao: "Mirin heye mîna çi-yayê Tay, mirin heye mîna perikekî (pûrt) sivik."

Che Guevara: "Mirovê ku ji mirinê direve tîrsonek, mirovê ku diçe bir ser mirinê ve qehremân e."

Feylesofê berê û yênen iro, li ser mirinê pirr tişt gotine.

Serek û pêşengên gelêri şoresserî gelek tiştên xweş diyar kirine. Lî belê, tu kesî li ser mirina mezin, mirina rojiya birçûnê tiştek negotiye û nenivîsandîye. Li ser vê mijarê, sazûmankar û rîberî rojiya birçûnê Gandî bi xwe jî tiştek ji me re nehiştiye. Ji bo wê yekê werin em wan qehremanan nas bikin û guh bidin têkoşînê wan.

ZİNDANA DİYARBEKİR

Ü BERXWEDANA ŞOREŞGERAN

Cîrûska pêşîn di sala 1982'yan de, Mazlum Doğan, di 21'ê Adarê, şeva Newrozê de bi sê darikên nîftikê mizgîni da me.

Mûmîn azadî, zarokêñ êr, stérkêñ jiyanê: Ferhat Kurtay, Mahmut Zengin, Eşref Anyîk û Necmî Öner, 1982, 18'ê Guilanê xwe xemilandin bi agirê Newrozê. Pişti wan dilovanan, M.Hayrî Durmuş, Kemal Pîr, Akîf Yılmaz û Ali Çiçek razan di hemêza rojiya mirinêde. Ki bûn ew egîtîn mezin?

M. Hayrî Durmuş: Di sa-

la 1955'an de, li bajarê Çewlikê (Bîngolê) li gundê Qumikê hat dinê. Endam û sazûmankarê PKK/KN'ê (Partiya Karkerê Kurdistan/Komiteya Navendî) bû. Ji parastina ramyari, berxwedan û serhildanê Zindana Diyarbekirê re pêşkêsi û pêşengî kir. 14'ê Tîrmehê dest bi berxwedana rojiya mirinê kir. Di roja 62. de canê xwe da. Gotina wî ya ku nayê jîbirkirin: "Wan qêrînê mirovan ji bîr nekin!.. Kurdistan êdî dibe Vietnam!.."

Kemal Pîr: Di sala 1952'an de, li bajarê Gümüşhane, qeza Torul, li gundê Güzeloluk hate dinê. Ji dê û bavekî Tîrk bû. Wezîfa xwe ya Enternasyonalîst raste rast pêk dianî. Digot: "Xelasiya gelê Tîrk û we-latê Tîrkiyê, bi azadî û serxwêbûna gelê Kurd û Kurdistanê re ye." Di Zindanê Diyarbekir de bû dengêñ Rojhilata Navîn. Bû dengêñ gelan. Ew jî bi Hayrî re ket rojiya mirinê. Di rojê 57. de şehîd ket. Gotina wî ya ku pirr jî tê hezirkirin: Endam û sazûmankare PKK/KN. "Em ji jiyanê pirr hez dikan. Ji bo wê

Mirin heye
û mirinok heye!..
Mirin heye mîna
jiyanê ye. Mirin heye
mîna mişkekî
mîrdar e!..
Mirin heye, birayê
jiyanê nû ye. Mirin
heye mîna tîfek
êşa zirav e!..
Mirina rûmetdar, miri-
na mezin, mirina
rojiya mirinê ye!..

mîdîkarin bimîrin!..

Akîf Yılmaz: Di sala 1956'an de, li bajarê Qersê, ji za Ardahanê, li gundê Beşiktaşê hat dinê. Di tu berxwedanê zindanê de li paş nema.

Parastina ramyari dikir. Di 15'ê Tîrmehê de kete rojiya mirinê.

Di 15'ê Îlonê de şehîd ket. Gotina wî:

"Her roj dilê min parce

parce dibe. Ne ji lêdanê, ne ji

tîrsê ye. Ji ber ku ez di bin esa-

retê de me, helak dîbim."

Ali Çiçek: Di sala 1961'an de, li bajarê Ruhayê, ji qeza Hilwanê, li gundê Karahêydar hanîne. Bi hevî yekî yekî yekî gotine: navê xwe pê ve tu

tişfi nîzanim" Ali Çiçek e. Berxwedana mezin li îşkencexanan nîşan dabû. Li kursiyê dadgehê bêtirs, di serhildanê de jîr bû. Ji ber vê yekê Hayrî "Stîrka Sor" navnîşan da. Bi Hayrî re dest bi rojiya mirinê kir. Di 17'ê Îlonê de şehîd ket. Gotina wî ya navdar: "Jiyana bêrûmet, her roj mirin e!.."

SERHILDANA DÎLAN DEST PÊ DIKE

Li hepsa Diyarbekirê, jiyan bi xwe bûbû işkence. Sazûmana şidatî û faşîstî dihate pêkanîn. Dijmin dixwest ku, tu mirovên girtî, şoresser nikaribe bibêje, "Ez şoresser im welatparêz im, însan im." Di wan şertên zîlm û zorê de pirr pêşeng, şoresser û endamên Partiya Karkerê Kurdistanê serê xwe hildidan. Digo-tin: "Em şoresser in, li hember sazûmana we ya mijokdarî û faşîstî şerê çekdarî dimeşînin. Heta mirovek ji me bimîne, em tu carî serê xwe natewînin."

Rojek ji rojan, dirokê pelên xwe nû dikir. Sala 1982, 14'ê Tîrmehê Hayrî li dageha Tirkan destê xwe hilda. Dadger, i-zin neda. Dîsa destê xwe rakir:

- Peyvîn min ên girîng he-ne. Ez dixwazim biaxivim. Dad-ger mecbûr ma.

- Tu dê ci bibêji Hayrî?

- Êdî daraziya me ne gengaz e (mimkûn). Hûn bi leşkerî di-meşin. Hevalê min Mazlum Doğan ji bo wan şertan canê xwe feda kir. Dîtina wî rast bû. Mazlum, tu carî ji mirinê netîrsî. Mirina wî raperîneke mezin bû. Iro ez jî bêqeyd û şert dikevîm rojiya mirinê. Heta iro ji bo para-stina ramyari em sekinîn. Êdî ew jî pûc bû. Pişti ku em nikaribin, parastina ramyari bikin, ji bo min jiyan nema ye.

Dadger tîrsiya. Kerm kum kir. Lê Hayrî bîryara xwe dabû. Gava zivîrî hat cihê xwe, çavên wî dikenîyan: Ev serkeftin e!.. "Ev serkeftin e!.."

Ali Çiçek, ji cihê xwe rabû:

- Ez jî daxili bîryara heval Hayrî dîbim. Û vê jî dibêjîm. Hemû, kuştinêñ li Hilwan û Rîhayê bûne min ew kirine.


Kemal Pîr rabû:

- Ez daxili bîryara Ali Çiçek dîbim. Min ji Esat re gotibû, ji nav hevalen min yek rabe, ezî diduya me.


Yekî din rabû:

- Ez jî!.. Girtî germ bûtûn. En din jî yeko yeko gotin:

- Ez jî, ez jî...



M.Hayrî Durmuş: "Wan qêrînê mirovan ji bîr nekin!.. Kurdistan êdî dibe Vietnam!.."



Kemal Pîr: "Ji bêsiûdiyeye me yek jê ew e ku dijminekî nemerd li hemberî me ye."



Akîf Yılmaz: "Her roj dilê min parce parce dibe. Ne ji lêdanê, ne ji tîrsê ye. Ji ber ku ez di bin esa-retê de me, helak dîbim."



Ali Çiçek: "Jiyana bêrûmet, her roj mirin el.."

Hayrî, li odaya nexwesxa-neyê bi tenê bû. Serkolekî Tirkan hate balê: "Hayrî, mirin pirr şîrîn e. Va ye şerbeta şekir. Ku tu nexwazî bimîr vexwe." Hayrî, destê xwe dirêji kir. Qede-h girt. Û carekê berda. Got: "Binêre serkolêñ Tirkan. Ez mi-rovekî şoresser im. Pişti xwe tu kîmâsiyê nahêlim." Qede-h li erdê parce parce bû. Peyvîn Hayrî li eniya serkole mîna gülleyan teqîyan. Hayrî li ser piya mir. Serê xwe ne li ber mirinê, ne jî li ber dijmin tu carî nete-wand.

Akîf û Ali jî ketin karwanê şehîdan. Ü her car, bîranîna wan bû yek: 12 Îlonê!.. Îlona reş û Îlona sor ceng dikir. Pêşengên jîr, şoresserên dilo-van bi xwîna xwe Îlona reş, sor kirin. Bi mirina xwe jiyan şîn kirin. Mirina mezin, mirina ku her dem di nav kef û destan de ye. Mîna bombeyekî di destê mirov de ye. Pîm hatiye kişan-dîn. Mirina wan mizgîna azadi-yâ me ye!..